



Parlamenterê Îtalî Luca Gambini

Tevgera kurd sosyalîst

RÛPEL 8-9

Nûçe:

Komplotê çareserîya
bêyî PKK'ê

Rûpel 3

Zülküf Kışanak


Mûsnakarê şoreşgerî
Mustafa Gezgör

Rûpel 6

Allattin Aktas

Di şûna peyvekê
de hezar peyv

Rûpel 4-5



SAMI TAN

Xwazî bi nîjadperestan

Helwest û nêzîktêdayîna hinek kesên tirk ku wekî "demokrat" tên nasîn, ramanekê li ser, mantiqê serdestên tirk ê li hemberî gelê kurd dide mirov. Ji gotin û awirên wan tê fêmkirin ku ew hê fêr nebûne ku kurdek bi nasnameya xwe ya neteweyî derkeve hemberî wan. Ew ji vê yekê re ne amade ne, lewre jî ew kes, şexsiyetên kurd ên ku jiyana xwe di ber doza kurdayetiyê de dane, wekî "tirkê bi eslên xwe kurd" bi nav dikin. Ev qas têkoşîn û berhemên kesên mîna Apê Mûsa û Ehmedê Xanî, di çav wan de ancax têrî vê yekê dike. Gelo ji bo ku yek nasnameya xwe ya neteweyî bi van kesan bide pejirandin, divê çi bike?

Li aliyê din ev nêzîktêdayîna, bîr û baweriyekê di warê çareseriyê ku ew kes ji bo kurdan difikirin de jî dide mirov. Sînorê çareseriyê wan jî diyar e, tirkên bi eslê xwe kurd, dikarin bi tenê doza qedexenekirina zimanê xwe bikin. Heke "pir" demokrat, dihêlin ku kurd dibistanên taybet jî ji xwe re yekin. Lê dewlet divê bi tu awayî alîkariyê nede wan, lewre bi

vê yekê ew dibin xwedî îmtîyaz.

Di bin vê ramanê de hesabekî veşarî heye, ew jî dizanin ku bi vê yekê çanda kurdî nikare xwe li ber pişaftinê rabigire. Lewre divê ziman û çanda berebaziyê bi ziman û çanda tirkî re ku li pişt wê dewlet heye bikin. Gelek pê pişrast in ku wê bi vê yekê ziman û çanda kurdî bibe rengekî çilmişî, di nava çanda mezina tirk de, lewre li ber çavan jî mînak hene; rewşa rûm û ermenan diyar e.

Kesên di vê bîr û baweriyê de tevgera kurd ku ji bo mafên kurdan ên çarenûsiyê têdikoşin wekî li ber xwe kelem dibînin, dixwazin ew ji holê rabe. Lewre ew jî dizanin ku heta ev tevger hebe, pêkhatina çareseriyê wan xewn û xeyal e. Kesên bi rengî di nêzîktêdayînê xwe de jî ji kesên nîjadperest ne cûdatir in, bes ew gihîştine vê baweriyê ku edî bi çîrokên berê kurd nayên xapandin, pêdivî bi çîrokeke post-modern heye. Lê dijîmîniya xwe li hemberî tevgera kurd venaşêrin, di vî warî de gelekî tûj in. Bo nimûne Cem Boynerê ku demekê wekî serkêşê vê

ramanê dihat nasîn, di ramanên xwe de ew qas hişt bû, ku dixwest nûçegihanê BBC'yê jî ji tevgera kurd re bibêje "terorîst", piştî ku nûçegihan ev daxwaza li derveyî rêz û rêçikên rojnamegeriyê nepejirand, wî jî bersiv neda pirsên nûçegihan.

Bûyereke bi vî rengî jî vê hefteyê hate serê hevalên me. Hevalên me xwestin li ser civînekê bîr û ramanên Doğu Ergil fêr bibin, lê piştî ku wî navê rojnameya bihîst û fêmkir ku ew a kurdên welatparêz e, digel şaşwaziya xwe li ser derketine rojnameyêke bi zimanê kurdî, dest bi lêpîrsîneke polîsane kir. Ergilê ku "çareseriyê kêşeya kurdî" ji xwe re kiriyê bar, ji hevalên me xwest ku ew navê rêxistina xwe bidin, piştre jî da zanîn ku ewê bersivê nede, pirsên rojnameyêke bi vî rengî.

Heta nêzîktêdayîna kesên mîna Ergil ev be, kî dikare ji rayedarên tirk çareseriyêke aştiyane hevî bike? Kî dikare bi awayekî misoger û bi dilekî rihet bibêje, heke xwediyê vê nêzîktêdayînê li Kerboranê leşker be, wê guh û tiliyê cendekên gerîla jêneke-û çavên wan dernexe?

Di bin vê ramanê de hesabekî veşarî heye, ew jî dizanin ku bi vê yekê çanda kurdî nikare xwe li ber pişaftinê rabigire.

Di ezmûna hebûnê de kurd

Ferhengok

SERVET ÖZKAN

- ajal: sewal
- akam: encam
- alozi: tevlihevî, arîşe
- arîsandin: guvaştin
- asayî: normal
- ast: sewiye
- awarte: îstisna
- balafirgeh: havaalan
- baldarî: bi diqetî
- belam: lê, lêbelê
- berbiçav: diyar
- berendam: namzet
- beyanî: sibe
- bipey: li gorî
- binemal: malbat
- bîrdoz: îdeolojî
- çêlikirin: behskirin
- daxwazname: îstida
- digel: tevî
- diyarde: kirû (olgu)
- doman: pêvajoyê
- eger: sedem
- ezmûn: tecrûbe
- gerdûn: alem
- girami: hurmet, rêz
- girse: cemtawer
- helwest: tewr
- heman: eynî
- hereşe: tehdît
- hevbeş: hevpar, şîrk
- hevcoot: paralel
- hişmendî: şîûr
- jiberkirin: ezberkirin
- jîndewar: jindar, zindî
- jûr: ode
- karsesat: trajedî
- karwanî: pratîk
- konevanî: siyaseta
- korzinde: stêwr
- lêm: kêma, nêma
- mawe: dem, kat
- mayînde: kalıcı
- metirsî: xem, endîşe
- moşek: fûze
- nakokî: dubendî
- nîma: remz (imge)
- nol: wekî, fena
- paşgo: îlave
- pelimîn: çilmişîn
- pergal: sîstem
- peywir: erk, wezîfe
- pesar: çolter (kır)
- pêdivî: pêwîstî
- pêşbîn: texmîn
- pêşdarazî: pêşhikum
- qeyran: krîz
- qerzdar: deyndar
- qufaltin: girtin
- rihakirin: rizgarkirin
- rist: rol
- rojgeren: planetrojivîsk: günce

Civak an jî neteweyên ku ji holêrakirina wan tê xwestin, xala wan a nêzik çand û hunera wan e. Heke di vî warî de têk biçin û ji rastiya xwe dûr bikevin, xwe bi xwe helîna tê rojevê. Heta ew gelên ku ji rastiyan xwe dûr dikevin, li rex neteweya serdest cih digirin. Di dîrokê de hatiye dîtin ku gelek civak ji ber ku li çanda xwe xwedî derneketine, ji holê rabûne.

Bi taybetî ew tevkujiyên ku heta salên 1940'î li welatê me pêk hatin û bûn sedemê koçberbûn û derbederbûna bi hezaran mirovên me, girîngiya van gotinên li jor dide diyarkirin. Dîsa çêkirina dibistanên mecanî (Yatılı okul) ku piştî salên 1940'î ji bo pişaftina zarokên kurd bi awayekî sîstematik hatine vekirin, vê armanca desthilatdaran didin der.

Lê belê ku di ber her tiştî de ew çanda ku wan nekariye ji holê rakin û hê jî dijî û li ser piyan e. Ew tevgera neteweyî û civakî ku li welatê me di van demên dawî de geş bûye, di warê çandî de ji bandora xwe daye nîşan û di vî warî de jî rê li pêşiya pêşveçûnê vekiriyê. Wekî hemû aliyan di warê çandî de ji hewldana gavavêtineke ber bi sazîbûnê ve heye.

Heke te bivê ku tu neteweyêke tune bikî, ji rastiya wî dûr bixî û heta, wî jî ji wî bi xwe re bikî dijîmin, divê tu çanda wî geli tune bikî.

Li hemberî vê yekê jî, heke gelek dixwaze hebûna xwe biparêze, divê ev gel li çanda xwedî derkeve, di vî warî de barê giran dikeve ser milên rewşenbîr û welatparêzên wî geli.

Tevkujiyên ku heta salên 1940'î li welatê me pêk hatin û çêkirina dibistanên mecanî ku piştî salên 1940'î ji bo pişaftina zarokên kurd bû.

Dema em di vî çarçoveyê de gelê me tinine ber çav, mirov nikare bibêje ku ewên navê welatparêzî û rewşenbîriyê li xwe dikin, vî yekê di kesitiya xwe de û di mala xwe de dane jiyandin. Dema mirov raserê hin kesên ku dibêjin hewldaneke me di warê pêşvebirina çandê de heye tê, mirov şaş dibe. Bi rastî û bivê navê, der barê wan kesan de dikeve gumanê.

Gelo di pêvajoya şoreşê de ew kes ji bo xwe hêviya çî berjewendiyê dikin ku divên xwe derxin pêş.


Hin kes hene ku xwe wekî ma-

mosteyekî zimanê kurdî bi nav dikin, dema tu dinêrî, tu dibînî ku di mala xwe de kurdiyê qedexê dikin. Dîsa ew kes ji bo ku ne di rengê kurdekî de bêne xuyan, xwe wek ewrûpawayan girê didin. Hin kes wisan dilê wan reş bûye ku ji bo êrişê ser bizava azadiyê bikin, her tim li keysa xwe digerin.

Qasê ku perwerdehiya mêtîngêran, zimanê îngilîz û fransiyana bala wan kesan dikişîne, zimanê wan ê zikmakî bala wan nakişîne. Ev tiştêkî aşîkar e.

Divê mirov li hemberî wan kesan hişyar bê. Ji bo ku ji van hinek sîdê bigirin, hin çaran dema sazîyên me nêzîkî van kesan dibin encameke erênî nadin. Ew kesê ku di jiyana xwe ya rojane de tu peywendiyêke wî bi jiyana gelê me re nemabe, wan nexweşiyên xwe di sazîyên me de jî didin jiyandin û li şûna ku sazî ji wan sîdê bigire, ew sazîyan ji bo berjewendiyên xwe bikartînin.

Ji ber van sedeman divê ku mirov li hember van kesitiyan her tim hişyar be. Em di vî baweriyê de ne ku gerek valahî li pêşiya van kesan neyêne hiştin, ji bo ku ew xwe der-nexine pêş û li ser nîrx û rûmetên ku hatine afirandin rûnin. Em di vî baweriyê de ne ku divê em van kesan dernexin pêş, meşhûr nekin û li pêşberî gel bi saetan van nedin axaftin.



LI GORÎ ajansa ANKA'yê roja 5'ê kewçêre li Kerborana Mêrdînê piştî lihevxiyê di navbera gerîla û leşkeran de, 2 gerîlayên ku zindî ketibûn destên lîmên taybet hatine kuştî. Her wiha bi otopsiya dozgera Kerboranê derket holê ku gelek îşkenceyên hovane li ceridekan hatine kirin. Li gorî otopsiyê guh û liliyên gerîlayan hatine jêkirin û çavên wan hatine derxistin. Sekreterê Giştî yê ÎHD'yê Nazmî-Gür, Endamê GYK'ya ÎHD'yê û Serokê ÎHD'ya Mêrdînê Cemil Aydoğan û saziyên wekî NÇM, HADEP, EMEP û SIP jî bi daxuyaniyên xwe ev bûyer protesto kirin. Çapemeniya tirk li hemberî vê kirina hovane bêdeng ma.



ÇAR parlamenterên rûsî ku endamên DUMA'yê ne, bi Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Kürdistanê Abdullah Öcalan re hevdişînek pêk anîn. Parlamenterên ji Partiya Liberal Demokrat Aleksey Mîrofanov û Aleksandr Filatov, ji Partiya Komünîst Leonîd Petrovskî û ji Partiya Yabloka Sergey Metrohîn, di hevdişîna digel Öcalan de daxuyandin ku teroristê rastîn Tirkîye ye, lê PKK bûye "qurbanê terorê". Her wiha çar parlamenter ji lûstîstên rûsî daxwaz kirin ku neçin Tirkîyeyê. Li hêla din endamê Partiya Komünîst Olega Miranov da zanîn ku wan berê Öcalan dawerî kongereya xwe kirine û ewê di rojê pêş de dişa wî dawet bikin.

NÛÇE

Komplot û çareserî bêtî PKK'ê

Li hemberî gurbûna çalakiyên gerîla ne tenê hêzên dagirker, welatên împeryalîst jî ketine metirsiyê, lewre jî hinek komployên navneteweyî li hemberî tevgera kurd dest pê kirin. Lewre jî di van rojên dawîn de komployên li dijî PKK'ê bi taybetî di warê navneteweyî de lez girtin. Digel van komployan hin derdor xebatên jî bo çareseriyê bêtî PKK'ê gur dikin.

Partiyên Karkerên Kürdistanê (PKK) ev nêzikî 15 salan e ku li dijî dewleta tirk şerekî dijwar dimeşîne. Ji başûrê Kürdistanê bigire heta herêma Bahra Reş, li gelek deveran çalakiyên gerîla pêk tên. Heftêya çûyî di çalakiyên gerîla de li gorî daxuyaniyên fermî yê dewletê jî bi dehan leşker hatin kuştin.

Li hemberî vê yekê rayedarên tirk dişa giranî dan ser şerê psikolojîk. Generalên tirk ku çûbûn hawara PDK'ê bêtî ku bigihêjin epcamê, destvala zivirîn, lê dev jî propandayê bernedan. Li gorî daxuyaniyên fermî di şer de 837 gerîla hatine kuştin, bi tenê 150 gerîla li Başûr mane û ew jî revîyahe herêma di bin destê YNK'ê de. Hê pir dem di ser vê gotinê re derbas nebûbû, hêzên dewletê yê ku ji Başûr vedigerin ketin kemûna gerîla û birek leşker hatin kuştin. Her wiha li Başûr jî hêzên yekîtiya neteweyî êrişên xwe gur kirin û gelek cih jî bin destê PDK'ê rizgar kirin.

Li hemberî vê rewşê ne tenê hêzên dagirker, welatên împeryalîst jî ketine metirsiyê, lewre jî hinek komployên navneteweyî li hemberî tevgera kurd dest pê kirin. Digel van komployan hin derdor xebatên jî bo çareseriyê bêtî PKK'ê gur dikin. Pêşengiya vê têkoşînê jî ji aliyê DYA, Brîtanya ve tê kirin. Wekî tê zanîn piştî ku başûrê Kürdistanê di 26'ê rezberê de careke din hate dagirkirin, di heman demê de rojnameya îngilîz Observer cih da îdiayên mirovekî bi navê Seydo Hazzar. Her wiha rojnameyên tirk jî bi şeweyekî berfireh bi navê "PKK li Ewropayê parçe bû" nûçeyek weşandin.

Li aliyê din hat daxuyandin ku li Tirkîyeyê jî hin hêz hewl didin ku "Bêtî PKK" kêşeya kurd çareser bikin. Rojên 8-9 kewçêre bi rêveberiya TOSAV'ê (Vaqfa Lêkolînê Ji bo Pirsgrêkên Civakê) li Hotela Martî ya Mêrsînê civînek hate li dar xistin. Li gorî agahiyên rojnameya Ûlkede Gündem, digel Prof. Dr. Doğu Ergil, Rojnameger Koray Düzgören, nûnerên DBP'ê (Partiya Aştiya Demokratîk), DKP (Partiya Girseyî ya Demokratîk) û nûnerên rêxistinên sîvîl beşdar bûne. Lê di nav beşdaran de



Kêşeya Kürdistanê bi hêbûna PKK'ê dest pê kir, îro gihîştê merhaleyeke pîr girîn û navnetewî bû. Bi vê yekê re jî gel bi her awayî piştgirî da PKK. Ev diîmen jî nîşandide ku ji heftsalî bigire heta heftê salî di meş û xwe pêşandanî tene dîtin

navê HADEP'ê derbas nedibû. Her wiha berî niha bi demekê, ji bo ku 21-22'ê rezberê li paytexta Belçîka Brukselê konferansê li ser kêşeya kurd bê sazîrîn, hin amadehî hatibûn kirin. Kesên ku ev konferans amade dikirin, bi îdiaya ku PKK aliyekî şer e, ji derdore kurdên welatparêz tu kes venêxwendibûn konferansê. Ev konferans jî ber hinek egerên nediyar, hate taloqkirin.

Doğu Ergil: Ez agahî nadim rojnameya we

Li ser panelê cara pêşîn, me xwest em diînen serokê TOSAV'ê Prof. Dr. Doğu Ergil bistînin. Lê, Ergil piştî lêpirsineke der barê rojnameya me de, da zanîn ku ew daxuyani nade rojnameyê ku piştgirîya hêzên "aşînexwaz" dike. Ergil pirsên wekî "Li piştî rojname kîjan partî heye", arasteyî me kirin.

Li aliyê din jî rêveberên TOSAV'ê rojnameger Koray Düzgören diyar kir ku rojnameya Ûlkede Gündem navero ka nûçeyê berêvajî kiriye. Ji ber ku civîn ne vêşarî bûye, lê çapemenî nehatiye agahdarkirin. Li gorî Düzgören HADEP

jî ji bo civînê hatiye vexwendin. Li ser vê yekê me xwestin raman û nixandînen rayedarên HADEP'ê fêr bibin. Lê mixahî hewldanên yê di vî warî bi ser neketin.

Li ser pirs me ya "Projeke ku piştgirîya PKK nestandîye dikare kêşeya kurd çareser bike" jî Düzgören wiha axivî: "Jixwe serokatiya PKK jî daxuyand ku, 'Em nabêjin teqez bi me re biaxivin. Ji bilî me jî hûn dikarin bi nûnerên gelê kurd re rûnîn.' Ji ber ku PKK jî dizane dewlet bi wan re hevdişînan pêk nayîne. Ji bo çareseriyê kêşeya kurd tiştê girîng dilxwazî ye. Lê, dewlet jî bo aşîyê ne dilxwaz e. Jixwe berê jî bi tasfiyêkirina mebûsên kurd şansê mezîni di dest çûbû."

Tarik Ziya Ekinci: Bê HADEP'ê çareserî nepêkan e

Li hêla din, T. Ziya Ekinci, ku navê wî jî di nav piştgirên TOSAV'ê de derbas dibû daxuyand ku bi tenê jî wî ji bo TOSAV'ê şewirmendî hatiye xwestin, wî jî pejirandiye. Ekinci piştî ku got ku haya wî jî civînê nîn e, da zanîn ku, TO-

SAV ne tevgerê siyasî ye, jî ber vê yekê jî bo çareseriyê kêşeya kurd nikare tiştê bike. Ekinî axaftina xwe wiha domand. "Hîn mirov xwe bi xwe li hev rûdînin. Ev tiştê ifade nake! Wê kê van wekî muhatap bihesibîne û pê re bi axive? Aliyên kêşeya kurd hene. Divê ew li hev rûnîn û biryaran bistînin."

Tarik Ziya Ekinci, li ser dawetnekirina HADEP'ê jî bal kişand ser piştgirîya gel ya ji bo HADEP'ê û diyar kir ku bêtî HADEP jî bo kêşeya kurd çareseriyê demokratîk naye dîtin. Ekinî axaftina xwe wiha girê da: "DKP û DBP jî ji bo çareseriyê kêşeya kurd têdikoşin. Lê, li cihekî ku HADEP heye tu girîngiya DKP û DBP nîn e. Jixwe bi hilbijartînan de jî ev yek derket holê." Digel vê yekê, rêveberê DBP Kenan Alabay li ser heman pirsê daxuyand ku, dawetnekirina HADEP'ê wan eleqedar nake, ew berpirsiyariya TOSAV'ê ye. Li gorî Alabay HADEP nayê wateya gelê kurd û tiştê girîng jî çareseriyê kêşeya kurd e, muhatap ne girîng e.

MAZLUM DOĞAN

Di şûna peyveke de hezar peyv

Dijminê mêtînger berê xwe daye mêjî û zimanê gelê kurd. Giranî daye bişaftinê; dîsa bi giyanê 1940'î, tanq û topan diajon ser ziman, dil û mejiyê gelê me. Lewma, emê hinekî li ser waşanên bi zimanê kurdî bi sekinin, rist û girîngiya wan û nêzikahiya ku li wan dibe, bînin zimên.

Weşan, navgîna ramanê, bîrdozî, konevanî û rêxistin, meşandina livbaziyan in. Weşan, dengê neteweyan û çînan e. Her wiha jî ew deng û parêzgerên berjewendiyên wan e.

Ew, tiştên ku di welat û gerdûnê de bûne û dibin germegerm dikin nûçe û digihînin mirovan. Weşan, ji bo gel û çînan wekî şibakeyan jî welat û gerdûnê re vedibin; mirov bi saya wan welat û gerdûnê dibîne, nas dike.

Weşanên me û perwerdehiya bi kurdî

Lewma, weşan di jiyana hemû gel û çînan de cihekî pir girîng digirin. Lê belê, îro ji bo gelê kurd ew risteke hezar carî girîngtir û mezinîr dilîzin.

Carekê gelê kurd, îro di nav şerê rizgariya neteweyî de ye û ev şer, şerê hebûn û funebûnê ye. Ev, ne şerê rizgariyê bi tenê ye; şerê jî nû de vejîn û damezirandina neteweyî ye jî. Weşan jî, ji bo gelê kurd, hem navgînên vejîn û rizgariyê, hem jî yên damezirandina neteweyî ne.

Dijmin nehiştîye û îro jî nahêle ku gelê kurd bibe xwedî dibistan û bi zimanê kurdî perwerde bibe. Lewma gelê kurd, xwendin û nivîsandina bi kurdî nizane; zimanê xwe jî pir ji bîr kiriye. Ji ber vê yekê weşanên bi kurdî, dibin navgînên perwerdehiya zimanê kurdî û rista dibistan û mamosteyan dilîzin.

Ev rista perwerdeyî ji gelek aliyê din ve jî tê listin. Weşan, dibin dengê dîrok û çanda me ya neteweyî. Gelek nivîskar û dîroknas, di nav rûpelên dîrokê de digerin, dîroka me ya windabûyî û parçebûyî didin hev û diwêşînin. Çanda me ya neteweyî jî wisa ye; ji destanên mîna Newroz, Gilgamiş û Ristemê Zal bigire, heta şexsiyetên wekî Ehmedê Xanê, Feqiyê Teyran, û Melayê Cizîrî; ji Mem û Zîn heta Siyamend û Xecê; ji Yekdestê Gemas hetanî Sorkî Alem ... çand û dîroka me, tînin ber çavên me û bi me didin naskirin; dilê me bi dîroka û çanda me ve girêdidin.

Weşanên me doza azadîya me dikin

Wekî din, waşanên me, dibin dengê şerê rizgariyê û çanda me ya rizgariya neteweyî. Destanên me yê rizgariyê roj bi roj û rûpel

Heger ku mirovên kurd bawer bikirina ku di demeke ne dûr de emê bigihîjin serketinê, azad û serfiraz bibin, wê xwendin û nivîsandin tev bi zimanê kurdî bibe, wê îro pirtir li kurdî xwedî derketibûna. Lê belê bi rizgarî û serkeftinê baweriya mirovên me hîn pir qels û hindik e, hinekan jî qet bawerî bi wan re tune ye.

Azadiya


WELAT

Rojnameya Hefteyî

SAL: 2 73

22 - 28 Pêşper 1997

SUNAH: 75.000 TL



Artesa tirk ji başûrê
Vietname ve digere

Hêpewîn Koma Amed: Em hunermendên şoroger in <small>Rûpel 8-9</small>	Mahmut Yıldız: Jêderka zimanê Hind-Ewropî Kurdistan e <small>Rûpel 4-5</small>	Servet Yûkselir: Binefsa Narin û Cembeliyê Mîrê Hekarî + <small>Rûpel 10</small>
--	---	---

bi rûpel û gernasên ku vî destanî dinivîsin, yek bi yek tînin ber çavên min, bi me didin naskirin û germahiya wan berdidin dilê me. Bi şehîdên zindanê, yên çiyê, yên serhildan û metropolan, bi çalakî û fedakariya serok û gerîla, bi cangoriyê welat û rizgariyê di rûpelê rojname û kovarên me de tê weşandin. Li ber agirê wan, zivistana dila germ dibe û tê de bihar dixemilîn. Weşanên me, di bin dirûşm û helbestên li ser serok û şehîdan, mûyên mirov radikin, mirov hêrs dikin û dikîşînin holên mîrxasiyê, yên tolhildanê.

Risteke waşanên me ya herî girîng jî ew e ku dibin navgînên yekîtiyê û rêxistinê. Ew riya rêxistin û yekîtiyê, giyan û zanista wê jî bi

mîrov didin zanîn. Weşanên me bi domdarî, ferman, rêberî û silavên serok digihînin gel. Ew ferman û rêberî carina di dilê mirov hestên neteweyî wekî lehiyê radikin û carina jî dil ji evîne dikin hêtûn û pêtal; mirov di riya serkeftinê de dimeşînin.

Haya me çiqas ji rista weşanan heye? Bi xemgînî em bibêjin ku, nêzikbûneke bi berpirsiyarî tune ye. Tu dibêji qey ev weşan ne bi zimanê neteweyî dertên. Tu dibêji qey ristên ku me li jor dane xuyakirin ji bo mirovên me tu tiştî îfade nakin.

Nifûsa gelê nêzikî çil milyonî ye. Weşanên me çend heb tene firotin, çend mirovên kurd weşanên kurdî dikirin? Mixabin

hejmara wan ji 3-4 hezaran ne zêdetir e.

Di bingeha van weşanan de xwîna bi deh hezaran şehîden me, xwîna wan keçên kurd ku xwe parçe parçe kirine, ya wan şehîden ku xwe dîrhem dîrhem helandine û cangorî kirine heye; keda xweş mirovên wekî serok heye, di bingeha wan de hêviyên hezar salan hene. Ma qey bi van nîrxên bilind ve girêdan û giramî tune ye? Em bawer in ku bi milyonan re ev giramî, evîn û girêdan heye, lê ev di dil de veşartî ye, xwe di xebatê de, di karwaniyê de nade xuyakirin. Lewma ew tu tiştî îfade nake.

Belê, bişaftinê nehiştiye ku gelê kurd bi kurdî xwendin û nivîsandinê fêr bibin. Lewma mirovên me xwendin û nivîsandina bi kurdî nizanin. Lê belê ew rewş dide xuyakirin ku ew fêrbûnê jî girîng nabînin. Tirkî ji mirovên me re rihetir tê. Li şûna ku bişaftin li zora me biçe, li rihetîya me diçe. Dijmin mirov çiqasî ji neteweyî dûr bixe, divê mirov sed car pirtir xwe bi giyana neteweyî bipêçe.

Îro fêrbûna xwendin û nivîsandina zimanê kurdî û lîxwedîderketina li weşanên me yê wekî Rewşen û Azadiya Welat, ji bo her kurdê bi namûs û welatparêz, sedemên rûmet û şerefê ne. Divê her kurd kirin û lîxwedî derketina van weşanên me ji xwere bike wezîfe û deynekî welatparêzî û neteweyî.

Heger ku mirovên kurd bawer bikirina ku di demeke ne dûr de emê bigihîjin serketinê, azad û serfiraz bibin, wê xwendin û nivîsandin tev bi zimanê kurdî bibe, wê îro pirtir li kurdî xwedî derketibûna. Lê belê bi rizgarî û serkeftinê bawerîya mirovên me hîn pir qels û hindik e, hinekan jî qet bawerî bi wan re tune ye.

Tu berjewendiya mirovan ên madî di fêrbûna kurdî de nîn e. Berjewendiyên bûjenî di xwendevaniya tirkî de, di ya dibistanên dijmin de têne dîtin. Lewma mirov berê xwe didin dijmin, ber bi wî diçin. Ew jî sermeke din e.


Divê ew rewş biguhere

Ji bo guherîna vê rewşa xerab, divê sazî û weşanên gelê me kampanyayekê vekin. Di vê kampanyayê de, divê malbatên girtî, gerîla û şehîdan, hemû rêveberê HADEP'ê, yê MKM û Tayd-Der'ê rêveberî, minakî û pêşkêşiyê bikin. Divê ew ji Jiyana Rewşen û Azadiya Welat re bikin abone.

Kirîna Azadiya Welat û Jiyana Rewşen di mehekê de nivî milyon dike. Ev dirav, buhayê da pakêta cixareyan e. Heger ku ewil mirov nikaribin bixwînin jî, wê hêdî hêdî fêr bibin.

Wekî din, ev malbat û mirovên ku wê minakî û pêşkêşiyê bikin, bila bi xwedî, nas û derdorên xwe jî bidin kirin. Her yek bila ji xwe re bike wezîfeyê welatparêziyê û şertekî endamiyê ku wan weşanan bi pêncî kesî bide kirin. Em bawer in ku bi xebat û kampanyake wiha, wê tiraja van weşanan bigihêje sed hezaran.

jiyana




REWŞEN

Kovara Ezbûn, Çavdêr û Hêvîyê

HEJMAR - D - KEWÇÊR - 1996

BIHA 100.000 TL



JI BO BÎRANÎNA APÊ MUSA

Ji bo vê yekê jî, divê weşan û nivîskarên me, bikin ku ji nav rûpelên kovar û rojnameyan, hilm û gûlma şer, ya neteweyî û welatparêziyê bilind bibe û xwendevan mest bibin, mûyê wan rabin, dilê wan bi giramî û evînê tijî bikin.

Werin em dilê dijmin li xwe xweş û rihet nekin. Werin em armanc û hêviya mêtîngeran di qerika wan de bihêlin; ew bêjeyê kurdî bikuje, werin em hezar hebî di şûna wê de jîndewar bikin.

ALAATÎN AKTAŞ
GIRTÎGEHA AYDIN

Bêkêriya helbestan

JAN DOST



Nivê şevê derbas bûye, nûçeyên birakujiyê zînge zîng in di guhê min de, dilê min tê guvaştin, dişewite... xame di destê min de ye û amade ye ji êrîşeke bêwidan re. Pelên spî jî bi tirs, lê bêdeng, li hêviya êrîşê ne. Îşev helbestek di serê min de dikele, peyv li bin guhê hev dikevin. Her ku ez hevokeke helbestî amade dikim, ez dibêjim, "A va ye min kîlîta helbestê xistiye destê xwe", ez bi qelsiya wê dihesim.

Gelo bi kêrî çî tê ev helbest, li ber vê xwîna ku erzan diherike; li ber qurşînên ku birayên xwe dikujin? Çî şerekî qeşmer e, çî kuştineke bêwate ye. Şev bêdeng derbas dibe. Qerîna vî

dilî tu kes nabihîze.

Ez dikevim şik û gumanan di helbestvaniya xwe de. Ez di ji xwe nefretê dikim. Ma heta xwîr nerije ez tiştê nanivîsim, ma heta kurdek neyê kuştin xameya lal naxebite?! Ma heta kengî wê xwîr bibe mijara helbestên min?!

Ez dişewitim, bi şewateke bêdeng, bêagir û bi qêrîneke lal. Hêyva ku stêrkan vedişêre jî bi min dikene, ji firehiya ezman dengê wê tê min: "Helbestvano tuyê çî binivîsî? Bi hezaran di bin ronîya min de helbest hatin nivîsandin. Kî planekê li welatê te digerîne, tu jî dilê rûpelan î. Hêrsa dilê xwe, şewata hinavên xwe bi helbestan sar dikî."

Çî bêkêr in helbest, li ber kuştina zarokê bêguneh. Çî bêhûde ne peyv, li ber vê gir û kîna reş. Lê ez rûpel, ez û peyv di keftûleştê de ne. Bayekî birîndar ji hêla Başûr radibe, xwîr ji aso diniquite, roj dereng hiltê, çî weşanên helbestvanan dirêj in, îcar tu helbestvanekî kurd î di ser halê xwe de, şeva te de diçe, berbang dibe

xewneke serjêkirî, dilana bêdengiyê nayê rawestandin.

Ferheng ji xwe fedî dikin, dibêjin: "Helbestvano bibore, em dizanin peyvên me têra êşa te nakin. Ma çî di destê me de heye? Tu me ji dîlîtiya ferhengan rizgar dikî, em dibin dîlên helbestekê. Xwedê hebîni me di halê me bihêle, em bi kêrî te û helbesta te nayên; em ne li gorî vî şerî bi qirêj in. Dengê segekî ji koleneke dûr tê. Gelo seg jî birakuj in? Ez bawer nakim. Parçeyek hestiyekî bêgoşt têrî deh segên birçî dike. Lê welatekî nîv-azad têra çî dike? Tenê dibe goristaneke giştî ji bo miriyên ne layiqî jiyane.

Xew çavên min nas nakin; çavên min rê nabin ser xewê. Çî şeveke gawir e. Hîn ez li ber rûpelê spî me, ne helbest tê, ne berbang tê, ne jî ev dilê şewitî sar dibe. Hêdî hêdî çavên min şil dibin, du hêstir li ber xwe didin, ji nişkê ve tepinî ji rûpelê min tê, şil dibe û hîn rûpela min li hêviya helbestê ye...

Mûsnakarê Şoreşî fermendar


Mustafa Gezgör

ZÜLKÜF KIŞANAK

Zîndan ra newe vejya bi û ame bi Stanbol. Des serî ra veşî zîndan de mend bi. Semsûr de, Amed de, Eskîşehîr de, Aydın de, Bûca de û zewbî zîndan de rakewt bi. Verê des û didiyê Îlonî jî Riha de, Semsûr de, Amed de, Mêrdîn de, û zewbî cayan de şoreşgerî kerd bi. Şarê nê heremans o rind silasnayê û ci ra rûmet girotê. kamî ke eya embazî kerd bi, pesnî dayê xo. Çirê ke Mistefa Gezgor, ê hereman de mend bi û înan embazî kerd bi. Mistefa Gezgor Wêranşahr ra bi. Qeçikiya de xeftiyayino gird dano. Wexto ke zîndar ra wêjya bi jî aşê ci Sirûç de bi. Vatê: "Sirûç wina nêbi, Sirûca ke men verada bi na Sirûç nêbi."

Embaz Mistefa Gezgor wexto ke ame Stanbol, kê ma de xeylî mend bi. Cok ra tayn bo jî wextê ma piya raverd. Ez ey ra raf çî misawa. Kîşta bawerî ra min jew merdim jî ey ser ra nêdi. Ey çîçî dayê xo vernî miheqeq berdê sere. Qiseyê ci û piratîkanê ci pê ra qe şaşnêbiyê. ey het de zerya kesî biyê gird û ganê kesî bawerî ra girêyayê. Jew fermendar ancî hind rind weşîna xo ya misnaye beno. Kes se vajo jî nêşeno ey biyaro ziwan. Çirê ke o Gezgor bi. Çend ke mi şayê, weşîna ey ra çiyê mişayê. Şoreşkerê winayîni dinya de taynê, la belê ma nêşenê biyarê ziwan û bidê naskerdin. Roşnikarê mayê ke pesnê xo danê û xo wertedê dinya de dînenê wa xo ra şemkerê. Ez bawerî kena ke ma bişayê Mistefa Gezgor'an bide naskerdin, rûmetê ma kurdan dinya de tewrî biyê veşî.

Embaz Gezgor, şaristan Aydın de zîndan ra viradyê bi. Wexto ke viradyeno, polîsî ey benê İzmir û hîrê rojî çiman bin de tepşenê. Polîsî ci rê vanê: "Ek şima dest ra yeno, mi deqeyna ewtiya de metepşê, la belê ez bawer nêkeran ke girdanê şima ferman bidê şima ke mi veradê." Polîsan ra jew şino û jew yeno, xo kenê feqîr û xo kenê rindek ke rewşê ci gahm bikerî. Embaz Gezgor weyneno ke iyê zaf kewtê qaxidê weşîna ci, wina vano: "Ezo şîrî kê xo û hesabê çewtina weşîna xo bikerî ke ney tepya rûmetê şarê xo bigîra." Polîsî na verpers sero benê şaş û wina vanê: "Tiyê vanê na ray, ray niya. Nê ne. No nêbi. Ek ti wina



vanê, ti Mistefa Gezgor niyê. Raporê ke ma dest de, winî nêvanê. Bew ney rind bizane, ma to katid de bîvinê mayê sereyê to cikerî. Ney qe xo apil ra meveje." Embaz Gezgor jî wina vano: "Ma pê rind silasnê û ma dermanê pê rind zanê ke çîçiyê. Ancî ez qisey nêkena." Nê qisan ra dima Embaz Gezgor veradyeno.

Rojê, mi ci ra persê kerd: "Embaz meselayê beqçî est a, a mesele çîçî ya?" Embaz Gezgor sereyê xo hewada, weyna çimanê mi miyan, xorf ra wiya û mi rê wina vat: "Kê to rê na mesela vat? Ek ti çiyê zanê, qandê çîçî, tiyê mi ra persê ci kenê?" Mi fina vat: "Ez çiyê zana, la belê wazeña to ra bimisa." Axirî Embazî ez nêşikîta û a mesele wina ard ziwan: "Ma ê rojan de newe newe partî dayê naskerdin. Ma kîştê ra şarî miyan de xeftiyayê û kîştê ra jî dêsan sero siloganî nûsnayê. Wexto ke şew biyê, ma kewtê kûçan û siloganê partî dêsan sero nûsnayê. Şewê jew embaziya ma fina dêsî nûsnayê ke, jew beqçiyê embazê mi tepest. Mi de jî dabança est

bi. Mi finê ra dabança ant û da sereyê beqçî û mi ci rê vat 'rew dabança xo berze.' Beqçî vengê mi ra ez sila nawa û mi rê vat 'şo kardê xo Mistefa.' Mi va 'wili bîli ezo to bikşa.' No fin beqçî qahriyê û mi rê wina vat, 'a ez piyê to ya, tiyê se vanê.' Wexto ke o qahriyê, mi fekê dabançî tayna kutkerd û mi ci rê wina vat, 'Raşto ti piyê min ê la belê o ke to tepîşt o jî embazê mino. Ek ti ey meveradê ezo to bikşa, şoreşgerî de pîmî çiniyê wa xeberê to bi bo.' Senî ke ez qahriyaya, beqçî ji embazê mi verada. Ma dabançê ci jî ci ra girot û herem ra dîrkewtî. Bahdo embazan dabança beqçiyê ci rê riştî. Na mesela ewna yo embaz." Embaz Gezgor weşîna xo de zaf şoreşgero gird bi. Ey qandê şorîş çiyê ra jî çimê xo rêkuwitê. Wertedê weşîna şoreşî de piyê xo rê jî destûr nedayê.

Mistefa Gezgor qula remayina Zîndanê Amedê jî wina ardê ziwan. "Ma di serî xeftiyayî û hindê heştay ûpanca metrî qul akerdî. Ma odeyê tewrî corî de mayê. Rojê jew embazî vat, 'wertedê ney dêsî de teba çiniyo.' Çend rojî tepya

ma dês şikit. Ma weyna ke werteyê dêsî veng o. Embazan biryarê viraştina qulî dayî. Bahdoyê na biryar embazan qandê viraştina qulî di komî viroştî. Min jî, ê koman ra jewî miyan de ca girot. Ma şew û roj di serî xeftiyayî. Hazar zahmeta ma qul qedînê. La belê hindê di metrî hesabê ma kemî vejya. Çirê ke fekê qulê teberdê desê keyî vejya. Ma fekê qul zere ra girot, ke şewê di şewî tepya dekwê keyî miyan. A şew jî yaxerê vara ke ma çiyê winî qe nêdi bi. Wexto ke qar çawt şino, hene çiyê ar yeno pê ser. Jûnakî jî fekê çirtik bind de qul abiyê bi û boyûna awa banî rijayê zeredê ci. Embazî xînt biyê. Yaxer bi bi belayê sereyê ma, çend rojî pêser varê. Ma embazê qul ra veradê cêr ke, oca de gurwe serî şino. Embaz nîmeyê qul de qîrê. Ma rew rew embaz ant cor. Embaz winî zerd, zerd bi bi ke ez nêşena ci biyarî ziwan. Embazî senî ke vat 'qul awa pir biya' ma pay ra kewtî. Xeftiyayîne ma wo di serî veng vejya bi. Ê rojan de, ma de qe tam nêmend bi. Xeberê wayirê keyî çiyê ra çinê bi. Ey jî mehla ra her û sî arêdayê û qula peydê banê xo pîrkerdê. Wayirê keyî se kerdê nêkerdê, qul pîr nêbiyê. Rewşê ma na xala ravêrdê ke rojê ma weyna ke dozê eri hewşê zîndanî de her aşaneno. Ti nêvanê embazo ke teber ra amewo ma biremno tepîşyayo û dişmenî rê heme çî vato. La belê embazo ke tepîşyê bi cayê qul nêzanayê. Kîştê ra dozeran her aşanayê û kîştê ra jî warirê keyî qul pîrkerdî. No gin ma zere de wiyayê mird kewtî. Axirî dijimîni cayê qula remayîni ma çend mengî tepya dîne." Embaz Gezgorî wexto ke qalê qula remayîni ardê ziwan, jû jû fin zerya mi girêyaye û jû jû ganê mi cemîdayê.

Embaz Mistefa Gezgorî diyinê xo ra zaf çî ard bi ziwan, la belê ê çiyê hemîna, na niwûs de kes nêşeno biyaro ziwan. Ey zaf şîrî jî nûsnayê û zaf weşî şîranê xo wendê. Awrûpa de şîranê ci jew pirtû de çap bi. merdim şeno ê şîran ra jî ey bîsilasno. Ez bawer kena ke weşîna ey sero zaf merdim jî, iyê diyinê xo bînuşê. Gezgor çend mengî dima şî teber. Oca ra ravêrd welatî, herema Şaristanê Riha de xeftiyane xoyo şoreşî ramit. Riha de serê mend nêmend ke Sûka Sirûç de çahar embazê xoya kewtî pûsûyê jew xayinî û şehîd kewtî. Fermendar Gezgoro, qe vîrî nêbo. O bi tij, û ma vernî de akewno.

Piştî salên 1990'î têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê tevî enî, artêş û saziyên xwe li seranserê bakurê Kurdistanê dest bi çalakîyên xurt kirin. Êdî ne bi tenê li gundan, li bajarên jî serhildan pêk dihatin. Piştî serhildanên Nisêbînê, Cizîrê, Hezexê, Kerboran Misircê û hwd. hêzên dewletê êrişên hovane birin ser gelên kurd. Yek ji wan jî roja 22'ê kewçêrê li Liceya Amedê qewimî. Tîmên taybet wê rojê Lice gulebaran kirin, di encamê de jin û zarokên bêguneh jî di nav de, 30 kes hatin kuştin, 100 kes birîndar bûn, 401 xanî û 242 dikan hatin rû-xandin.



Filozofê frênsî, di dema şerê cihanê yê yekemîn de dikeve Partiya Komunîst a Fransa yê ji bo ku di birdoza partiyê de nûjenîyan çêbike. Li gorî Althusser, marksîzma rastîn bi Kapîtal Marks dest pê dike. Althusser; heta sala 1980'î li "Ecolê Normale Supérieure" ê ders dane, piştê jî ber nexweşîyeke psikolojîk jîna xwe dixeniqîne. Ji ber vê yekê wî di-avêjin "Nexweşxaneyê dînan" Piştî ku jî wir derdikeve heta roja ku bim-re li "avahiya bêkesan" jiyana xwe didomîne. Çend berhemen wî ev in: "Pour Marx (ji bo Marks 1965)", "lire le Capital (Kapital çawa tê xwendin)", "Lenin û Felsefê" û "Li hemberî Hegel Marx û Lenin."

Axînek ji qafkasya

Film di germahiya şer de bi kemîneke mîlîsên çeçen ku, du leşkerên rûsî dil digirin, dest pê dike. Jixwe mijara sereke a film jî, jiyana van her du kesên dil e.



Van rojan filmek di navê "Kafkas Mahkumlar (Bendiyên Qafqasan)" li sinemayan tê nîşandayîn. Film jî romana Tolstoy hatiye wergirtin.

Piştî filmê Anna Karanîna ya ku ji hêla derhêner Bernard Rose kişandibû, ev filmê Sergei Bodrov dibe filmê duyemîn ku ji romanên Tolstoy hatiye wergirtin û niha li sinemayên Tirkiyeyê tê nîşandayîn.

Tolstoy berî niha bi salan şerê di navbera rûs û çeçenan de, ew kîna bêsînor a di navbera her du neteweyan de, bi dîtina û ramanên xwe yên balkêş nivîsibû. Derhêner Sergei Bodrov ev şer û kîna di navbera her du gelan de bi awayekî hostetî li hev aniye û kiriye film.

Film di germahiya şer de bi kemîneke mîlîsên Çeçen ku, du leşkerên rûsî dil dikevin, dest pê dike. Mijara sereke ya film jî jiyana wan her du kesên dil e. Derhêner derûniya esîrên şer bi şeweyekî hostetî di film de nîşan daye.

Her du esîrên rûsî li gundekî biçûk di axurê Abdulmurat de tîn veşartin. Abdulmurat jî di gundê xwe de mirovekî birûmet e. Abdulmurat her du esîran nakuje, bi ser de birînen wan dipêçê. Lewre kurê Abdulmurat jî di destê rûsan de dil e. Armanca Abdulmurat taqaskirin e. Lê mixabin piştî demekê kurt meselaya taqasê pêk nayê û li ser vê yekê gundî li dijî kirina Abdulmurat reaksiyonê nîşan didin û dixwazin ku wan esîran bikujin.

Di film de derûniya şer jî aliyê derhêner ve bi awayekî hostetî hatiye eşkerkirin. Her wiha dîmenên ku tîn pêşkêşkirin jî naverokê

bêhtir xurt dikin. Ligel van yekan derhêner navenda sedema şer bi şeweyekî zanistî û zanîyê ditiye û li gorî dilê Tolstoy amade kiriye. Di film de jî wekî şerê li Kurdistanê malbatên dîlan der heqê bûyeran de nerast tîn agahdarkirin. Balkêş e di destpêka film de zarokê stranekê dibêje, naveroka vê stranê jî hinek stranên kurdî tîne bîra mirov. Ev stran vî rengî ye: Ev ax, axa me ye/ Ev bi salan e ku em li ser vê axê ne/ Bayê çiyayên me tîrsê dixê dilê neyaran...

Dema tevî vê stranê hin dîmenên balkêş jî çeçenistan nîşan didan, bêhemdê xwe em jî bi xwe re dibirin serê wan çiyayan. Ji ber ku em jî ne dûrî wan dîmenan bûn. Seneryoya film jî serî hetanî binî berhemeke aligirê mirovahiyê ye. Ji ber vê yekê bêhna nijadperestiyê û sovenistiyê jî film nayê.

Belê ev film jî her aliyê ve bandoreke domdar li ser mirov dihele. Dilşewatiya dê û bav ya di nav şer de, bi şeweyekî zanîyê tevgerîna wan nîşan dide. Di dawîya film de nêzîk-te dayîna zaroka çeçen li hemberî esîrê rûsî jî balkêş bû.

Zaroka çeçen jî her wekî zarokên Kurdistanê kuştina mirovan nedixwest. Jixwe di film de jî dihat gotin ku di nav şerên neteweyan de yên alînegir zarok in.

Her çiqas ev romana Tolstoy ne wekî Anna Karanîna bi nav û deng be jî, piştî ku jî aliyê derhêner Sergei Bodrov ve bû film, ji hela temaşevanan ve hate acibandin. Ji hela teknîkî ve di film hîn kêmasî balê dikîşînin, lê dîsa jî film hêjayî temaşekirinê ye.

AZAD AVŞIN

ÇAVDÊRÎ

"40 Mîlyon û du ronakbîr"



Ev çend sal in ku di rojname, panel, sêminar, radyoyên herêmî û di dawiyê de jî, di MED-TV de li ser ronakbîrên kurd gotûbêj tîn kirin. "Ka mirov dikare ji kê re bêje ronakbîr û ji kê re jî nikare bêje?..." Di her gotûbêjê de dubare heye û heman tişt tîn gotin. Her kesê ku beşdarî platformê dibe bi awayekî gelemperî tarîfa ronakbîriyê dike û dixwaze vê pîvana han jî bo ronakbîrên kurd jî bi kar bîne. Hemû di gerînekeke gelek teng de li dora xwe dizivirin, zelalî û rîya rastiye nabînin.

Dema ronakbîrî tê gotin çend kesên ku dikarin bi kurdî bixwînin û binivîsin tîn bîra wan kesên beşdar. Wê demê çî dibe, navnîşan diyar dibe. Îro bêhtir li derveyê welêt, li Swêdê xwendin û nivîsandin di nav kurdan de heye. Wek Arşîmet dibêjin: "Ha me dît ronakbîrên kurd bi tenê li Swêdê hene. Hebûnê hene, lê hezar mixabin tiştêkî nakin!" û vê carê berê top û tîngên xwe jî her welatê Ewropayê ber bi Swêdê ve dikin û tiliyê dikîşînin: Bommm.. bommm... ku bommm... Lêdin la-wo lêdin-hemû ronakbîrên reformîst li wir in! Swêd tê-bombeyarankirin. Di cemsara bakur de dîxan bilind dibe.

Di vê mijarê de, nezalalî heye. Nezalalî çî ye? Nezalalî ev e ku ronakbîr tîn tevlihevkin. Heta ne nivîskar jî, bi tenê ew çend kesên ku dikarin bi kurdî bixwînin û binivîsin. Bi dîtina min alozî û tevlihevî di vir de ye. Wiha tê diyarkirin ku ew kesên ku dikarin bi kurdî binivîsin û bixwînin ew ronakbîr in û yên ku bi zimanekî din dixwînin û dînivîsin jî nezan in, an jî li derveyê vê kategoriya ronakbîran dimînin. Nezalalî û tevlihevî di vir de ye û ev dîtina jî vir heta mala Xwedê şaş e. Dema wiha be, divê mirov gotûbêjê bibe ser ramana ku bi girîngbûna xwendin û nivîsandina bi kurdî ve girêdayî ye. Ronak zanist e û ronakbîr jî zanî û zanistiyê jî bo pêşveçûn û refaha gelê xwe û heta gelê cihanê bikaranîn e. Bi kîjan zimanî dibe bila bibe, fêrî tune. Bi tenê pênûs ne ronakbîrî ye. Bi zanistî û hişmendî rahistina çakûç, çekhilgirtin, avakirina bend û benedvan ...

Hinek kes derdikevin TV'yê û li ser navê zanîne îfda dikin ku du ronakbîrên kurd hebûne. Mûsa Anter û Î. Şerîf Wanîly. Ji derî wan tu ronakbîrên kurd ne çêbûne û ne jî dê çêbibin. Ji vê gotinê dixwaze bêje "sê kes in, lê ez navê yê sêyem nadim, bila yekî din bide." Cîvata ku sê ronakbîr jê derbikêvin, ez dibêjim bila ew civat tune be baştir e. Mirov ev çî zanist e, çî hişmendî ye!

Îro Kurdistan, ne Kurdistana berê ye. Li bajarên Dîlok, Riha, Amed, Meletî, Elezîz, Erzerom û Wanê gelek zanîngeh, fakûlte û dibistanên bilind hene. Di salekê de çend hezar kes jî van dibistanên bilind mezûn dibin. Piraniya wan kesên xwenda kurd in. Her wiha di metropolan de jî; bi hezaran kurd dixwînin û ji van dibistanên bilind mezûn dibin. Di nav bizava rizgariya neteweyî de bi sedan, heta bi hezaran kesên ronakbîr hene ku serokatiya wê dikin, wekî kadro dixebitin û hinek jî wan çek û pênûsê bi hevûdu re, bi kar tînin. Ji aliyê din ve, di nav HADEP'ê û sendikayan de, bi hezaran kesên xwenda û zane hene. Gelo hûn çî nav li van kesan dikin? Di komelatiya (civaka) kurd de çihê van kesan li ku ye?

Têkiliyên zanistiyê bi dijberiya rikokî û hîsî tune. Kesên zane, bi metodên zanistî rastiya civaka xwe tînin zimên û holê. Bi telesiyên zanistî, li ser encama tiştan dipeyîve.

Tevgera kurd sos



Di van salên dawîn de pîrsgîrîka kurd bala Îtalyayê diqîşîne. Bi taybetî jî konferansa Romayê ve helwestê zelaltir kir. Sedemên vê çi ne?

□ Hêzên paşverû û demokratîk agahiya raya giştî ya der barê şerên demokrasî û azadiyê de zêde dikin. Ev tişt bi giştî ji bo hemû gelên ku têdikoşin tê kirin. Lê li Îtalyayê em baş dizanin ku gelê kurd bindest e û hemû mafên wî hatine bînpêkirin. Tiştê ku dibe sedema baldariyê me hevpariya erdnîgarî ye. Em ji hev û din ne dûr in. Bi vî hawî ev sedemên navborî bala raya giştî ya Îtal-

yayê dikişînin. Girêdayî ve baldariyê xebatên çareserîya pîrsgîrîkê wekî mijareke girîng tên rojevê.

Raya giştî ya Îtalyayê der heqê têkoşîna gelê kurd de çi qas agahdar e?

□ Divê em bibêjin ku gelê Îtalyayê di van çend salên dawîn de bala xwe da pîrsgîrîka kurd kir. Bi tenê çapemenî, çapemeniya çepgir û pêşverû hinek agahiyên rast dide. Lê ev têrê nake; zêhîf kême. Em bi vê armancê têkiliyên xwe bi hêzên pêşverû re datînin. Em wekî nûnerên hêzên pêşverû ên gelê Îtalyayê ji bo ku agahî bi dest bixin li vir in. Em

Îdiaya hikûmeta tirk îdiayeke pûç e; xwe xapandin e. Pîrsgîrîk bi riya propagandayan nayên safikirin. Pîrsgîrîk girîng û birîn kûr e; têkildarî dîrokeke dirêj e. Lewre ez bawer nakim ku pîrsgîrîkeke wiha bi azîneyên wiha zû bi zû biqede.

bi van çalakiyan dixwazin riya têkiliyên xurt vekin.

Hûn helwesta dewleta tirk çawa şirove dikin?

□ Ji bo ku em helwesta hikûmeta tirk baş bibînin, çî sedem nîn e. Helwesta wê hikûmetê pir neyînî ye. Lê em bawer in ku ew ne bi tenê ji bo pîrsgîrîka kurd wiha ye. Em baş dizanin ku Tirkiye wekî dewletekê di qada (pêgîha) navneteweyî ya îroyîn de yek ji yên herî paşverû, herî neyînî û herî kevnepêst e û em difikirin ku hêzeke bîngêhî li Tirkiyeyê heye û ev hez ne bi tenê li hemberî rizgariya Kurdistanê radiweste an jî gelê kurd dipelişîne, heman dewlet hindikahiyên din jî diçewisîne. Li tenîsta van, hêz û eniyên pêşverû û demokrat jî bi têra xwe pest û kotekiyan ji vê dewletê dibînin. Tirkiye li qada navneteweyî xwediyê dimenekî wiha neyînî ye. Em ji bi pêwendî û bi hemû hêza xwe bala xwe didin ser xebatên teşhîrkirinê.

Der heqê pîrsgîrîka kurd de siyaseta hikûmeta Îtalyayê çi ye? Ji bo baştirbûna ve helwesta hikûmeta we, çî xebat li ber we hene?

□ Ji aliyê hikûmetê ve hewldan nîn e. Ji ber ku hikûmeta Îtalyayê ji hêzên pîrdengî pêk tê. Di hikûmetê de digel hêzên pêşverû hêzên paşverû jî hene. Mixabin serokwezîrê me bi xwe nûnerê hêzên paşverû ye û girêdayî ve yekê, nêzîkedayîna hikûmeta me li pîrsgîrîka qewîn bi giştî neyînî bû. Bi piştigiriya hikûmeta Tirkiyeyê dijîtiya wê li hemberî tevgera kurd selmand. Lê hêzên pêşverû ve jî tê piştevaniya ve hikûmetê dikin. Wekî mînak, partiya me ya komûnîst di nava hikûmetê de cih nagire, ji derve piştigiriyê dide hikûmetê. Lê ne bi tenê ev partî, gelek endamên parlamentoyê yên ku piştigiriyê didin hikûmetê jî, alîgiriya xwe ji bo însiyatîfa bi navê "Aştî ji Kurdîstnê re" diyar kirin. Nemaze di nav wan de 64 endamên parlamentoyê bi awayekî çalak xebitî û ev koma ku ji 64 kesên parlamenter pêk tê ji bo çalakiya Trêna Aştîyê ya Mûsa Anter hewldan. Ew kesên navborî bi awayekî erênî ji bo ku li Kurdistanê aştî pêk were û mafên gelê kurd bîn dayîn, tevdigerin. Hûn niha dikarin nakokîya rewşa hikûmeta Îtalyayê bibînin; serokwezîr rastgir e, digel vê yekê jî, hêzên pêşverû û çep-

gir ku hevkarên gelê kurd in jî, piştî hikûmetê digirin.

Ew 64 endamên parlamentoyê ku me qala wan kir bi saziyên kurdan re pêwendiyên berdewam hene. Hevkarî û alîkarî hene. Piştigirî ne bi tenê manewî ye.

Têkiliyên hin endamên parlamentoyê an ji endamên hikûmetê bi PKDW'ê re bi çî rengî ne?

□ Helbet têkilî bi parlamentoya kurd re jî hene. Ez dikarim mînakê bidim: Berî niha hevdiînek di navbera me û serokê komîsyona PKDW'ê de çêbû. Piştî vê hevdiîtinê biryara çalakiya trêna aştîyê hate standin. Têkilî germ in û ne bi tenê bi parlamentoya Îtalyayê re tenî danîn. Konseya Ewrûpayê jî bala xwe dide ser van xebatan. Danûstandina agahiyan a saziyan di têkiliyên me de cihêki girîng digire. Bi giştî em dikarin bibêjin ku têkiliyên baş û berdewam bi PKDW'ê re hene.

Baş e, hikûmeta tirk dibêje ku wan hêza tevgera kurd anî radeyêke nizim. Di vê mijarê de hûn çî dikarin bibêjin?

□ Îdiaya hikûmeta tirk îdiayeke pûç e; xwe xapandin e. Pîrsgîrîk bi riya propagandayan nayên safikirin. Pîrsgîrîk girîng û birîn kûr e; têkildarî dîrokeke dirêj e. Lewre ez bawer nakim ku pîrsgîrîkeke wiha bi azîneyên wiha zû bi zû biqede.

Girêdayî ve, hûn helwesta Almanayê çawa dinirixînin?

□ Helbet em bi zîmanekî tund li dijî helwesta hikûmeta almanî derdikevin. Tê zanîn ji ber ku hikûmeta almanî hatina trêne asteng kir, em bi dijwarî hatin vir. Biryara wan ev bû û bi gotina xwe kirin. Sedema vê yekê jî têkiliyên siyasî û aborî yên di navbera hikûmetan de ye. Lê yê ku têkilî û berjewendiyên xwe yên bi Tirkiyeyê re ji çareserîya pîrsgîrîkê girîngtir dibînin ne bi tenê Almanya ye. Hikûmetên din ên ku di Yekîtiya Ewrûpayê de cih digirin ji berjewendiyên aborî jî demokrasî û azadiyê girîngtir dibînin. Baş diyar dibe ku ev helwesta hanê nakokî ye. Divê yek ve çareser bike. Hikûmeta almanî yek jî du hikûmetên kevnepêst ên dawîn in ku di nava Yekîtiya Ewrûpayê de cih digirin. Hûn jî dizanîn, piraniya hikûmetên Ew-

rûpayê guherîn û ew hikûmetên nû çepgir in. Bi vî hawî em dikarin bibêjin ku hikûmeta almanî ya herî kevneperest e. Em difikirin ku ev rewşa heyî ya Almaniyayê wê bi hatina hikûmeteke pêşverû biguhere. Lê niha pirsgrêk ji her awirî ve berdewam e û em li hemberî Yekîtiya Ewropayê tê dikoşin da ku em pirsgrêkê çareser bikin.

Parlamentêrên Yewnanî serokê giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan vexwendin parlamentoya xwe. Wekî vî, di parlamentoya Îtalyayê de hûn dikarin qala vexwendineke wiha bikin an jî gelo di wê babê de amedekarî hene?

□ Di parlamentoya Îtalyayê de gelek hêzên paşverû hene; hêzên faşîst jî hene. Ji ber ve yekê vexwendineke bi vî rengî pêkan nîn e. Li hêla din ne hemû parlementerên Îtalî, lê ji wan beşeke mezin bi awayekî sîvil dikarin li ber vî karî rabe. Vexwendineke fermî di vê pêvajoyê de dijwar e. Niha em li vî dikarin wiha bibêjin; piştî ku em veşerî Îtalyayê emê bi vê mebestê bi komîsyonan re, bi parlementerên û hêzên paşverû re û bi parlementerên kurd re hevdişînan çêkin. Em nikarin soz bidin ku emê teqez bikin. Vexwendina birêz Öcalan daxwaza me ye jî. Em bi tenê bi riya hevdişînan dikarin vê pêşniyar bikin.

Bi ya we divê bingeha aştiyê çawa be, ev aştiyê divê aştiyê çawa be?

□ Bersiva vê pirsê gelek dijwar e. Ev pirsgrêka şer e. Gelê kurd jî bo aştiyê jî divê şer bike. Tiştî ku em dikarin bikin danûstandina agahiyên e. Ev tişt gelekî girîng e. Ji ber ku raya giştî ya Ewropayê di vî warî de serwest nîn e. Hewl û mebesta me ew e ku heta jî me bê em raya giştî agahdar bikin da ku pêjinkariyek bê himatê. Bi vî hawî, karê me dê hêsanîr bibe.

Hûn ramana kesên ku sosyalizmê di warê çareserkirina pirsgrêkên neteweyî de qels dibînin, çawa şirove dikin?

□ Ez bi xwe endamêkî partiyê komünîst im. Girêdayî vê, em difikirin ku di cihana îroyîn de pirsgrêka demokrasiyê xwe dide der û bêguman bêyî dada civakî çareserîya pirsgrêkên demokratîk ne pêkan e. Sosyalîzm bi serê xwe bersiv nîn e, lê ji pirsazazadiyê re bersiva yekemîn e. Helbet divê tu car neyê jî bîrkin ku cihana me cihana berî bîst-sî salan nîn e. Niha li pêşberî me ji her awirê ve cihareke nû heye.

Li gorî we, bîrdoza sosyalizmê nûbûnê çawa divê?

□ Üff! Wisa tê ditin ku dê galegeleke gelek dirêj bibe. Diyardeya yekem a



ku divê em baş fêm bikin ev e ku kapitalîzm guhartinê zehf mezin derbas kirin. Ji bo ku em li hemberî domana kapitalîst a wekî "globalîzm" tê binavkirin, têbikoşin, divê em tixûban ji navê rakin. Yanî têkoşin divê bi awayekî navneteweyî û enternasyonalîst bê domandin. Bi serê xwe têkoşin ne dîdewar e, çewt e. Berê pîrî car sosyalîzm û nasyonalîzm (neteweperwerî) bi hev re bûn. Îro ev çewt e. Rûyê kapitalîzmê global e; wekî pergalekê pêdiviya têkiliyên di navbera hêzên paşverû de tîne rojevê. Divê hemû hêzên paşverû, hemû rêxistinên sosya-

Pîrs ev e ku her gelê ku ji bo mafên xwe şer dike, gelekî serîhildayî ye û li hemberî pergaleke çewşîner bi têkoşina xwe risteke girîng dilîze. Kapitalîzm jî vê dibîne. Her şerê jî bo azadî, ji bo mafên mirovan jî hemû şer û tevgerên cihanê yê ku didomin re dibe hevkarîyeke hêzdar, şerêkî wiha bandora xwe li ser tevgera navneteweyî dihêle. Lê taybetiyê cihêreng a tevgera kurd van rojan bala me kişand. Di rêxistin û tevgerên din de taybetiyê wiha nîn e. Baldariya wê tevgerê bêhtir li ser pirsgrêkên civakî ye. Ev taybetî, tevgerê hûn pêşverûtir

piştgiriya xwe diyarkirin. Ev hejmareke mezin e. Digel vê piştgiriyê, ew dixwazin ku bîr Kurdistanê. Ji xeynî wan 64 kesan, ji parlamentoyê hin endamên din jî, li dijî astengkirina trêne helwesta xwe nişan dan.

Piştî ku hûn veşerî, hûnê çî bikin?

□ Sedema hatina me ew bû ku em derfetên ragihandinê bi dest bixin. Niha li ba me gelek jimarên telefonê hene. Emê pêwendiyên xwe ne bi tenê bi nûnerên gelê kurd ên li Ewropayê re bido-minin, emê van derfetan bi kar bînin da ku bûyer di heman kafî de deng vedin.

Em baş dizanin ku Tirkiye wekî dewletekê di qada navneteweyî ya îroyîn de yek ji yê herî paşverû, herî neyînî û herî kevneperest e. Em difikirin ku hêzeke bingehîn li Tirkiyeyê heye û ev hez ne bi tenê li hemberî rizgariya Kurdistanê radiweste

list dest bidin hev û din. Digel vê yekê, ev pêvajoya globalîzasyonê pêvajoyeke xwerû nîn e. Û em hîn der heqê vê pêvajoyê de bi qasî ku pêwîst e em ne serwest in. Em nizanin çî ye, çî nîn e. Wekî Lenîn dibêje: "Diyê em tim û tim texmînim, gava xwe tekûz bavêjin." Divê em bi baldarî lê hûr bibin û fêm bikin ka çî diqewime. Em vê yekê nikarin bi serê xwe jî bikin, divê hêz û rêxistinên paşverû yê din hemû bi hev re vê yekê bikin. Partiya me Encoradî piştewaniya hevdişînan û danûstandinê hêz û rêxistinên paşverû yê Ewropayê dike, li tenîştê vê, em piştewaniya Foruma Sapo Poloya Latî Amerîkayê jî dikin.

Girêdayî vê, hûn tevgera kurd çawa dibînin? Tevgera kurd sosyalîst e an na?

□ Xem nake. Em dikarin mîna sosyalîst an jî antî-împeryalist bi nav bikin.

dike. Bi vî hawî, nav li vê tevgerê kirin pêwîst nîn e. Bes ev girîng e: Her tevgera ku doza azadiyê dike, bi pêwendiyên xurt bi tevgera antî-kapitalîst ve girêdayî ye.

Lê hûn çî difikirin? Tevgera kurd sosyalîst e, an na?

□ Her tevgera ku doza azadiya gelê xwe dike, sosyalîst e. Ji ber ku li hemberî pergala kapitalîst radiweste sosyalîst e. Dîsa jî em dibêjin ku ev tevger bi qasî şer, li ser nixandina civakî radiweste, li gorî tevger û rêxistinên din bêhtir sosyalîst e.

Wekî pirsazazadî, ji xeynî we, bi mebesta hevkarîya vê çalakiyê, gelo parlementerên Îtalî yê ku dixwastin bîr, hebûn?

□ Wekî me berê jî dabû xuyakirin, 64 parlementerên parlamentoya Îtalyayê

Ji we pêştir kes bala xwe dide vê rewşê?

□ Ji bo partiya Komünîst asteng nîn e. Ji parlamentoyê gelek kes hene ku mîna min bala xwe dane ser reşwa Kurdistanê. Hin Parlamenterê Îtalyayê bi çend salan berê bi mebesta çavdêriyan çûn Kurdistanê. Partî dem bi dem bi nûnerên kurdan ên li Îtalyayê re hevdişînan çêdike. Beşa karê derveyî ya partiyê bi berdewamî rewşa Kurdistanê dişopîne. Bi awayekî berdewam, serokê partiyê tê agahdarkirin. Ev jî rê dide gotûbêjan. Li Îtalyayê rewşa Kurdistanê dibe mijara gotûbêjan.

Dawî tişteki ku hûn dixwazin bibêjin?

□ Gelê kurd ne bi tenê ye. Ne bi tenê li Îtalyayê li her derê Ewropayê hevkarîyek heye. Ev hevkarî girêdayî me û we roj bi roj zêdetir dibe. Divê em li ser wê babê bi baldarî rawestin û bidin xwe ku vê hevkarîyê zêdetir bikin. Ji bo vê, tiştê pêwîst, danûstandinên bi rêkûpêk in. Divê em ji bîr nekin ku di cihanê de gelek gelên bindestî dozên azadiyê dikin. Wekî peyva dawî, em dîsa dibêjin ku gelê kurd tenê nîn e.

HEVPEYVÎN: AZAD ALTUN
JI ÎNGÎLÎZÎ: KAWA NEMİR

Helbestvanê ronak Cegerxwîn

OSMAN ÖZÇELİK

Berî 13 salan di şeveke sar de stêrkek li asîmanê kurdan xwî-ricî. Stêrka kurdan ya herî rewnak sexwebûna kurdan lêxistibû; li xerîbiyê, ji dest û çiyayên xwe bi dûr sekinî. Wî dilî êdî nema xwîn dida cege-
ra bixwîn. Çavên wî vekirî mabûn û li valahiya dûr dinêrin. Berê çavên wî bi Kurdîstanê de bûn. Gotibû li min bis-pêrin axa min. Ew Cegerxwîn bû: An-go Mela Şexmûsê Hesar. Di şevê bi mij û sar de li Swêdê, li bajarê Stok-holmê, laşê wî yê sar û cemidî wisa dirêj li erdê bû. Sal 1984 bû. Kalê ci-wanmêr û rûken gotibû êdî bes!

Sal 1903 ye. Li Mêrdînê, li gundê Hesarê bi navê Şexmûs kurek hate din-yayê. Ev kur wê bibûya Cegerxwîn û wê navê xwe bigihanda temama din-yayê. Malbeteke feqîr bû. Ji 11 zarokan 3 jiyabûn. Berî şerê cihanê yê ye-kemîn, Hesen û Eşyeanê keça xwe A-siya û kurên xwe Xelîl û Şexmûs hildi-girin bar dikin diçin Amûdê. Di deme-ke kurt de dê û bav di navbera salekê de li dûv hev du dimirin. Her sê zarok şûnde tên gundê Hesarê. Paşê dîsa ve-digerin Amûdê û li wir bi cih dibin. Şexmûs biçûk bû, li cem birê xwe Xe-lîl dima. Belê ji destê jimbira xwe debar nekir çû ba xuşka xwe Asiya. Ew ji fe-qîr bûn. Diviyabû bixebitiyana, di wê olamê de nan bi dest herkesî nediket. Şexmûs li cem wan şivanî, rênçerî û paletî dikir. Şerê yekemîn qediyabû û di nav Amûdê û Mêrdên de "Xet" ha-tibû kişandin. Şexmûs hêj nizanibû ev xet parçekirina Kurdîstanê ye.

Li cem axa û dewlemendan xebitî. Di zaroktiya xwe de, xwe di nav şerê jiyane de dît. Zordestî, şelandin, birçî-bûn, durûtî, neheqî bi çavên serê xwe dît û nas kir. Cehaletî û nezani nas kir. Dibistan kêr bûn û wî nikaribû bix-wenda.

Şexmûs qîma xwe bi vê jiyana bexêr nedianî. Di kûraniya dilê wî de agirekî nenas pêketibû. Dixwest bixwî-ne û hîn bibe. Di 18 saliya xwe de li cem melayan dest bi xwendinê kir. Gund bi gund li medreseyan geriya. Wî xwendina 15 salan di 8 salan de qedand. Li ber Şexmûsê pale û şivan din-yaya zanistiyê vebûbû. Di medreseyan de çand û edebiyata kurdî ya klasîk nas kir. Tina şîrên Melayê Cizîrî û Eh-medê Xanî di medresan-de gihîşt keze-ba wî û birîna yekemîn di wan salan de ket dilê wî.

Piştî ku medreseyan deştê qedan-din, çû welatê soran û ji wir gihîşt des-ta lehîcanê, nav Kurdîstana Rojhilat.

Jiyana kurdan ya civakî, ziman û zargotina kurdî û folklorê gel dilop bi di'op dawerivî ruhê wî û di mejiyê wî de bingeha neqşê şîra wî wisa ava bû.



Em ji bîranînên wî agahdar dibin ku, bi şerê Şex Seîd kela welatparêziyê dikeve dilê wî. Ew dibêje: "Ez ji Şew-qî Begê Erxanî hînî kurdperweriyê bûm." Piştî xelaskirina xwendinê Feqî Şexmûs bû mela Şexmûs. Li gundan dest bi melatîyê kir. Li pêşiya gundi-yan nimêj dikir, mehra gundiyan dibi-rî, bi fitre û zikatê jiyana xwe dido-mand. Jiyana bexebat; bi fitre û zikat bi wî giran hat. Biryar da ku bibe cot-kar. Rabû du gund ava kirin. Navê ye-kî "Çelek" û yê din jî "Cehenneme" bû. Ew bi xwe li cehenneme rûdinişt.

Cegerxwîn piştî Ehmedê Xanî wekî lehiyeke mezin bi gurmîn ket nav ede-bîyat û jiyana kurdan. Wek avbendek hilşe û ava har, dar û beran bide ber xwe, belav bibe hemû dest û newalan xwe, ket nav jiyane. Pêtiyên volqa-na dilê wî her yek bû şîrek û pijiqîn. Ew volqan tu caran venemirî û îro jî pêketiye, dîsa dişewitîne dîsa ronahî dike der dora xwe.

Li dijî axa û şexan derket û heval-bendiya gundiyan bazar û ziman kir. Ji bo hişyarbûn û yekîtiya kurdan çî aste-nî hebûn êrişî ser wan kir, xofa dilê în-sanan hilweşand. Ji ber bir û bawer-riyên xwe bêtirs bû.

Pir neçû ew kesên zordest, kevnep-

rest ku bi kirinên xwe ketibûn hem-bêza îxanête jî wî açiz bûn. Digotin, "mela dîn bûye xurîfiye, kafir e."

Cegerxwîn pêwendiyên xwe ji "dîn" jî dibire ûvedigere ser dînê kur-dan yê kevnere. Di şîrên xwe de bi Zerdûştîyê, bi "Mishefê" û bi "Lales" sond dixwe. Ne ku baweriya wî bi Zer-dûştîyê te. Ji ber ku Zerdûştî dîn e kur-dan ê kevn e. Sedema xwedîtiya Zer-dûştîyê ev e. Ji bo Cegerxwîn çî kurd be, ew meqbûl e.

Sal 1932 ye. Li şamê kovarek dertê. Navê kovarê "Hawar" e. Piştî şkestina Serhildana Şex Seîd gelek rewşenbîrên kurdan riviyan, çûne binxetê.

Êdî ew li Şamê ye. Û li der dora wî Osman Sebrî, Qedrî Can, Dr. Nazîf Beg hene û dane ser rîyeke pîroz "Ha-war"ê diweşînin. Hawar di demeke kurt de dibe hêvî û hawara kurdan. Ce-gerxwîn jî êdî nav daye. Şîrên wî bi destên melayên welatparêz gund bi gund digerin û pêlên hişyarbûnê li çar aliyê Kurdîstanê belav dibin.

Seydayê mezin ne bes şîrek bû, wî dizanî ku xebatên edebî bê yên siyasi tîr nakin. Di sala 1973'yan de li A-mûdê "Komela Azadiya wan kurd" a-va kiribû. Fikrên welatperweriyê û kurdî belav dikirin. Sûrî di bin destên

kolonyalistên fransî de bûn. Fransiyayê ev komele girtin.

Di sala 1946'an de dibe endamê "Civata Azadî û yekîtiya Kurdîstan" ku navê wê komelê yê berê "Xoybûn" bû.

Cegerxwîn jî ji bandora "Şoreşa Kewçêr"ê bêpar nema. Wî cara yekemîn di şîrên xwe de qala proleterya di-kir. Wî bawer kiribû ku rojekê wê artêşa sor ji jor were hewara kurdan. Cotkar û karkerên Kurdîstanê jî bi yek-bin, wê Kurdîstaneke bêkedxwarî, ser-bixwe û wê jiyanê pak ava bibe.

Ramanên komunistiyê Cegerxwîn dikemilîne û wî dighîne merteba nav-neteweyî ye. Êdî ew şîrekî înternas-yonalîst e. Doza aşîtiyê di rojeva din-yayê de ye. Dinya bûye du bend û şerê sar doza aşîtiyê bi pêş dixwe.

Sala 1949'an Cegerxwîn dibe he-valê komunîstan û rexneyan li Xoy-bunê digire. Dibêje: "Cara yekemîn e ku dubendî ketiye nava min û malme-zinan."

Sala 1957 hevkarîya Cegerxwîn bi komunîstan re diqete û ew bi hevalên xwe re Saziya "Azadî" ava dikin. Di 1958'an de jî Azadî bi partiya Demok-ratên kurd li Suriye re dibe yek. Di 59'an de Cegerxwîn bi hîlbijartinê dibe endamê Komîta navendî ye PDK-S. Wê salê partî wî dişîne Kurdîstana Ba-şûr. Li Akedemiya Kurdî ya Bexdayê ew dersên ziman û edebiyata kurdî di-de. Piştî du salan şerê Kurdîstana Ba-şûr dest pê dike û Seyda vedigere Sûri-yeyê. Bi şîrên xwe piştigiriya şer kir, hêz da pêşmergeyan.

Cegerxwîn tu caran hêza xebata bi rêxistin ji bîr nekiriye û girîngiya par-tiyê dizanibû.

Partî me

Partîm e, rêzanê te me

Pispor û pêzanê te me

Hozanê xêzanê te me

Ez ne bawer im ku tu kesî bi qasî wî jiyana kurdan ya civakî nas dikir. Kesî bi qasî wî navên teyr û tebayên Kurdi-stanê, navên kulîlk û nebatên welêt, ha-let û edawatên cotyarî nizanibû. Kesî bi qasî wî navên malbat û eşîrên kur-dan nedizanî û nas nedikirin. Li cox-rafyaya Kurdîstanê çiya bi çiya, newal bi newal deşt bi dest geriyabû. Wî di-roka kurdan hûr û kûr dizanî. Û zane-bûna xwe di şîrên xwe de, di çîrokên xwe de dinivîsî. Ji heşt diwanên wî yên ku hatine weşandin ferhengêk fireh derdikeve.

Cegerxwîn bêrawestan 60 salî li dermanê xwe geriya. Derman bi dest neket û ji nav me bar kir, çû. Belê li şû-na xwe bi milyonan Cegerxwîn hiştin û bi milyonan Cegerxwîn îro jiyana xwe didin da ku dermanê wî bi dest bi-xin.

□ Li NÇM'ya Stenbolê 18.10.1997. Şemî:

Semînera Haluk Gerger: "Li Tirkiyeyê krîz", saet: 15:00 Muzîkal:
Gulên Mezrobotan, saet: 17:30
19.10.1997. Yekşem: Konsera Koma Amed Saet: 14:00
Koma Amed di sala 1992'yan de di nav NÇM'ê di cih girt. Koma
Amed heta niha sê kaset derxistine: "Kulîlka Azadiyê", "Agir û Mirov" û
"Dergûş." Ev kom ji 8 kesan pêk tê. Ji Beşa Sînemayê ya NÇM'ê film:
"Strana leşker", derhêner: Grigorî Chupaî. 24.10.1997. În. Ji Beşa
Sînemayê ya NÇM'ê film: Şeva Son Lorenzo, derhêner: Tavianî
birayên hev.

Çalakiyên vê hefteyê



□ Li BEKSAV'ê 20.10.1997. Duşem:

Film: "Deh rojên ku dinya hejandin", derhêner: Banhûrchuk.
Ev film li ser şoreşa sovyetê ye. Film bi giştî derheqê tekoşîna
çîna karkeran a Rusya û Partiya Bolşevîk agahiyan dide.
22.10.1997. Çarşem: Film: "Demiryol (Rêhesin)", derhêner:
Yavuz Özkan. Film bi taybetî cuntaya 12'ê rezbera 1980'yî
têkoşînen politîk û rewşa siyasî bi nêzîkê dayîneke cihê reng
dinirxîne. Di film de li ser çalakiyên xwendewavan û yên kark-
eran ên berî cuntayê tê rawestîn.

Divê mirov şer nas bike



Coşkun Aral li navenda çandê ya BEK-
SAV'ê panelek li dar xist. Berî dest-
pêka panelê sînevîzyonek der barê
bernameyên Coşkun Aral de hate nîşandayîn.
Coşkun Aral piştî sînevîzyonê der barê nûçe-
gihaniya objektîf û bazirganên şeran de ra-
manên xwe yên balkêş daxuyandî.

Li gorî Aral divê çapemenî rastiyan bi a-
wayî objektîf binivîsîne. Çapemenî beyî cuda-
kirina ziman, ol û nijadê divê xebatên xwe bi-
ke. Aral diyar dike ku di cihanê de tu nijad di
ser nijadeke din re nîn e. Ji aliyên din ve, A-
ral helwesta çapemeniyê ya tirkiyeyê jî, wekî
nêzîkê dayîneke çest dinirxênî û diyar dike
ku li Tirkiyeyê reqabeteke erzan heye, nûçe
bi riyên hêsan û girêdayî berjewendiyên roja-
ne tene amadekirin. Li gorî Aral çapemeniya
tirk gelê Tirkiyeyê jî agahiyan rast dîr dixe.

Wekî tê zanîn coşkun Aral bi amadekirina
bernameya xwe ya der barê jiyana gelên ci-
hanê tê nasîn. Me jî li ser vê yekê pirsêk aras-
teyî Coşkun Aral kir. Me got: "Hûn li hemû
cihanê geriyên, we dîmenên balkêş kişandin
û di bernameyên xwe de cih danê van bû-
yerên cur bi cur, niha li Tirkiyeyê jî şerê he-
ye mixabin we dîmenek jî wî şerî nekîşand û
hûn gel pê agahdar nakin sedema vê çi ye?"

Li gorî Aral li heremê politîkayê dijwar
heye, kirina wî karî li Tirkiyeyê pir zahmet e.
Aral carekê, du caran serî li walî xistiye, lê
encameke erênî jê derneketiye. Her wiha Aral

dide zanîn ku dema Serkaniya Giştî ya Artêşa
Tirk wan derdixe operasyonê, nûçeyê li gorî
daxwaza dilê xwe bi wan didin çekirin. Ser-
kaniya giştî mintiqaya ku tiştêk lê nîn e, nîşa-
nî wan dide û dibêje bikşînin. Li gorî daxuya-
niyên Aral dema li helikopterê jî siwar dibin
leşkerek li ser serê wan dişekine û cihên ku
berê ji aliyê serkaniya giştî ve hatine destnî-
şankirin, bi wan dide kişandin.

Her wiha li gorî wênekêş Aral rastiya şer li
hemû cihanê wekî hev e. Aral kirin û me-
todên wan gişkan wekî hev dibîne û wekî mî-
nak jî, li Salvador mangayên mirinê, li Fili-
pînê altamata û li Tirkiyeyê jî tîmên taybet di-
de. Ji aliyên din ve Aral diyar dike ku metod
û kirinên van gişkan wekî hev in.

Ji aliyên din ve li gorî nûçegihan Coşkun
Aral parêzeriya aştiyê di naskirina şer re der-
bas dibe. Aral der barê şerê li Tirkiyeyê de jî
diyar kir ku li aliyê Başûrê Rojhilat, feoda-
lîzm heyê, dewlet bi zanatî nawaze wê perga-
la kevnare jî holê rake ji ber ku bi hêsanî di-
kare bixapîne.

Aral di dawîya axaftina xwe de diyar dike
ku, çapemeniyê rola xwe ya mezintirîn di
şerê Vîyetnamê de listiye û li Amerîkayê gelê
amerîkî li dijî şer rakirîye ser piyan. Dîsa ew
dide zanîn ku der heqê şer de gel bi dîmenên
balkêş hatiye agahdarkirin. Li Tirkiyeyê û li
hemû cihanê rojeke bi wî rengî nêzîk e.

A.ZÊRO

TÎŞK

Başûr, şerî şer an
şerî aşti?



BEKIR BAHOZ

Li wîtarî hefteyê rabirdû da, basî pêwîstî yekgirtinî hêzêkanî gelî kurd-
man kird û wîtarî bizûtinewey rîzgarîxwazî gelî kurd lem qonaxe
da, le hemû kat ziyatir pêwîstî be dariştin û girtine berî stratîjiyêke
neteweyî hewbeş heye. Zor be ser ew nûsîne da derbaz nebû ke le
başûrî Kurdistan, bilêsey şerî nawxo tawî send û şerêkî berfirawan destî
pê kirdewê. Helbete başûrî wa ye ke mirov le derwe temaşay rûdawekan
bikat û be çawêkî bêleyan lêkiyan bidatewe, legel ewe da le hokanî
tazebûnewey şer û le ser ciyawazî xulî em carî şer û xulekanî pêşû
rawestê. Aya be rastî şerî em car herwa xulekî asayî şer e û legel
carekanî rabirdû da ciyawazî niye? Bêguman çawdêr be çawxişandin be
rewtî rûdawekan da, boy derdekewê ke îtir kêşey kurdî be giştî û kêşey
kurd le başûrî Kurdistan be taybetî, pêy nawête qonexêkî niwê.

Partî Demokratî Kurdistan (PDK) ke layenêkî serekî şerî nawxo ye, le
başûrî Kurdistan, her le seretay helgirsandinî em şere negrîs û mal-
wêrankerewe hewl dawê her çî hêz û layenî tirî xwarûy Kurdistanê, le
meydan derxat û siyasatî firawan xwazî xoy be ser Kurdistan da
bişepênê. Bo ew amanceş, le girtineberî hiç rêyek silî nekirdiwe, be tay-
betî hanabirdin bo dagirkeranî Kurdistan û dawetkirdinî supakaniyan bo
ser xakî azadkirawî Kurdistan, ew xakey ke her bistêkî be xwênî deyan
mirovî kurd sur e.

PDK, 31-Abî 1996, bê hênanewey gardî komarî Iraq bo Hewlêrî
paytextî Kurdistan, gewretirîn heley stratîjî encam da le meşûy 50 saley
xoy da ke cemawerî kurd û layenekanî Kurdistan nawêyan lê nabû
"xiyaheftî gewre". Em reftarey PDK dij be layenekanî tirî Kurdistan, îdî
berew gel û berey dagirkeran û hawkaranî le yek cûda kirdewê.
Piştbestin be rijîmî Iraq, wate ew rijîmey ke dirindanetirîn şewazî
çewsandinewê û le nawbirdinî dij be gelî kurd bekan hêna, cemawerî
kurdî hênaye ser ew bawerê-ke her kes û layenêk bigête berey rijîmî
Iraqewê, pêwîst e giwêrayelî xwestekanî ew rijîme bêt û be pêy xwast
û wîstî ew bicûlêtwê. İtir gelî kurd lem xalewê be tewawî biryarî beren-
garbûnewey dagirkeran û hawkaranyan da.

Karêkî dujminkaraney tir ke hiçî niye le pelamardan û dagirkirdinî
Hewlêr, dawetkirdinî arteşî tirk e bo ser xakî başûrî Kurdistan. Wek îy
hemû kes aşkira ye, supay Turkiyê le ser bangêşî PDK, rojanî 14'î gulan
û 24'î rezber (mangî 9'yem), du hêrîşî berfirawanî kirdê ser başûrî
Kurdistan. Êmê lêra de bas le amanca dîrekanî Turkiyê nakeyn le
Kurdistan, çûnke ewe çî lay cemawer û çî lay hêze siyasîkîna kurd rûn
û aşkira ye. Belkû bas le encamêkî ew hêrs û pelamarane dekeyn ke
ewîş yekgirtin û le yek nizîkbûnewey beşî zorî hêzêkanî başûrî
Kurdistan e; wate em car ke le başûrî Kurdistan ser le niwê şer destî pê
kirdiwe, pêwîst e lêre da çawdêr xalêkî girîng le bir nekat, ewîş ewe ye
caran şer le nêwan PDK û YNK da bû, belam em car rûdawekan
derencamî rûdawekan wa nişan deden ke YNK em car le ciyatî layenêkî
şer, endamî bereyekî berfirawan e dij be PDK. Ciyawazî here girîngî şerî
em car lem xalê da derdekewê, her le ber eweş e ke çawerê ke şerî em
car le hoy helgirsan de ciya wan nebê, belkû encamekanîş ciyawaz
debin. Helbet e lêre da karî ême ewe niye biyanû bo şer bidozînewe,
çûnke encamî hemû şerêk malwêranî û kawilkanî ye barûdaxî emroy
Kurdistan başûrî. Nîmûney ew qîseyeman e. Belam zor caranîş
layenekanî şer, diway şerî giran be xo da dênay û naçar debin mil bo
daxwazî û berjewendî gel biden û le ciyatî şer rêgay aşti helbijêrin. Ca
gelo şerî em car, şerî şer e, yaxud şerî aşti ye?

Destana Tahir û Zahirê... (1)

Mîr û wezîrê bajarê Paloyê li nav bexçeyê qesrê rûniştîbûn, bi hev dişewirîn û derdên xwe ji hev re digotin. Mîr û wezîr, her du jî korzinde (kordûnde) bûn. Teled û weled ji bo wan tunebû. Çiqas ziyaretên enbiya û ewliya hene, li ser geriyane, dixtor û hekîm jî nehiştine ku serî lê nedane lê, tu fêde ne dîtine. Ne dora wan jîn dibe û ne jî ya jinên wan. Wezîr jî mîr re dibêje:

—Mîrê min, ka ji vî derdî me re çareyekê bibîne. Emrê me çû, lê, me zaroyek li ber mala xwe nedît.

Mîr dibêje:

—Wezîrê min, va ye tu jî dizanî, me hekîm, bijîşk, rimildar ku kitêb û hirûfan dixwînin nehiştin, me serî li gîşkan da. Ziyaret şêx û mişayix nemane ku em li ser negeriyane. Lê, erdekî hişk û ezmanekî bilind e. Ka emê çawa bikin? Êdî tu çareya me nemaye. Ger ji me bûya, me yê jinên xwe berdana. Qet nebe em nedibûn sebebê wan. Lê ne ji me çêdibin û ne jî ji jinên me, wa ye xuya ye.

Wezîr got:

—Mîrê min, Xwedê derd dide, lê derman jî dide.

Mîr Got:

—Wezîrê min, weleh dermane me ji Xwedê ye.

Hîn wilo digotin, bala xwe danê ku derweşek rastî wan hat ku nizanin ji kîjan hêlê derketiye holê. Derweş got:

—Esselamûneleykûm ya derderûnan.

Hema Mîr ji ber rabû û gotê:

—We eleykûmselam ya derdêderman.

Derweş got:

—Tu ji ku dizanî ku ez derdêderman im?

Mîr got:

—Kesê ku bizanibe mirov bi derd e, mijheqeq ew dermanê derdê mirov jî dizane.

Derweş destê xwe avêt berîka xwe, du sêv jê derxistin, yek da mîr û yadî jî da wezîr. Derweş got:

—Sêvan bibin malê û bikin du felq. Felqekê hûn bixwin û bila felqekê jî jinên we bixwin. Pişt re eger ku Xwedê teala warên we şîr kir, hûn bêyî min nav li zarokên xwe nekin. Ezê werim nawan li wan bikim.

Mîr got:

—Hay hay! li ser çawan. Mîr dest avêt berîka xwe ku şabaxekê yan tiştêkî bidê, lê nedît ku derweş çawan ji ber wan winda bû. Mîr û wezîr şaş û mat man, li hev nêrin û gotin:

—Gelo ev xewn bû, yan xeyal bû?

Mîr got:

—Wezîrê min, qet serê xwe neêşîne ji vî meseleyê re; em rabin herin malê. Me hezar dermanên wiha bikaranîne, bila ev jî yek ji wan be. Hema, ev jî



sêvek e û em bibêjin ku; me ji bexçeya xwe jêkiriye. Tewekel bi Xwedê.

Mîr û wezîr berê xwe dan aliyê malê û wekî derweş kirin. Neh mehên wan qediyar, Xwedê taala li wan hate rehmê; Keçek ji Mîr re çêbû û kurek jî ji wezîr re...

Her du zarok jî bûn pênc salî. Mîr û wezîr li ser soza ku dabûn derweş tu nav li zarokên xwe nekirin. Rojekî wezîr jî mîr re got:

—Mîrê min, ev zarok ketin pênc saliya xwe, êdî xwe nas dikin û hîn bê nav in. Gelo, emê bi çi navî gazî wan bikin?

Mîr dibêje:

—Rast e, werê ye. Lê te jî dît ku derweş di nava me de bû. Ji xwe Xwedê li ser wechê wî li me hate rehmê. Gere di bîra te de be jî ku derweş gotibû: "Heta ez neyem, hûn nav li zarokan nekin." Piştî ku ev serê pênc salane derweşê me serî li me nedaye, êdî em jî li hêviya wî nasekinin.

Wezîr got:

—Belê mîrê min, werê ye. Xwedê dizane, gelo ka derweşo tu heyî yan tune yî? Tuyê werî, tuyê neyî kî çi zane? Gelo ka hîn di bîra wî de ye?

Rabûn ziyafetek lidarxistin, xwarin û vexwarin amede kirin, gazî gelê xwe kirin. Vexwendî hatin, xwarin û vexwarin ku dor hata dema nav lêkirina li zarokan. Mîr, bala xwe da ku derweş waye kete hundir. Mîr çû pêşiyê.

Derweş got:

—Esselamûnaleykûm ya derewîno.

Mîr bersiv da û got:

—Weeleykûm selam ya derenghatiyo.

Derweş got:

Navê lawik deynin Tahir û yê keçikê jî Zahir e. Pişt re jî xatir xwest, da rê û çû. Bêyî mîr kesî derweş nedîtibû.

Mîr vegeyriya fatiheyê piştî xwarinê xwend, berê xwe da mêvanan û wiha got:

—Hûn dizanin derdê me çi ye?

Gotin:

—Xwedê xêr bike. Derdê we çi ye?

Mîr got:

—Zarokeke min û yek jî yê wezîrê min hene ku bûne pênc salî, lê me hîn nav li wan nekiriye. Em dixwazin nav li zarokên xwe bikin. Bi ya min be, hema emê navê lêwîk Tahir û yê keçikê jî Zahir lê kin...

Tahir û Zahir bûn heft salî. Wê çaxê li qesra Paloyê seydayek hebû, navê wî Erebo Xoce bû. Mîr gazî Erebo Xoce kir û jê re got:

—Erebo Xoce, ev zarok teslîmî te; çi qudret û qeweta te heye, tu yê serf bikî. Zanîna te, îlmê te çi hebe, tuyê bi rayê wan bidî. Ji aliyê din tu li dinê çi bixwazî ezê bidim te. Lê belê, şertekî min jî heye, dema ez van zarokan îmtîhan bikim û heger te tiştêk nedabe wan, ezê serê te jêkim.

Mîr, bi çil û çar wezîrên li meclîsa xwe bi Erebo Xoce re peymanek destxet kir (îmze) û her du zarok dan ber destê Erebo Xoce ji bo perwerdehiyê.

Heft salên zarokan li ber destên Erebo Xoce ji bo perwerdehiyê qediyar. Rojekê, mîr her du zarok îmtîhan kirin. Mîr bala xwe dayê ku Tahir gelek li pêş e, lê Zahir li paş maye. Mîr, berê xwe da Erebo Xoce û got:

—Xoce, li nav me peymanek hebû. Ew di bîra te de ye?

—Belê, mîr.

—Çi belê. Vaye encama îmtîhanê. Zahir gelek li paş e, ji bo çî? Erebo Xoce bala xwe dayê ku rewş xerab e. Me sele wê here heta jêkirina serê wî, got:

—Mîrê min, çi qudret û qeweta min heye û çi zanebûn û îlmê min hebû min ji bo wan serf kir, lê sedema li qaş mayîna Zahirê ewe ku; Tahir bi çavên biratiyê li Zahirê dinihêre le, Zahir bi çavên evîni li Tahir dinihêre. Tu heta Tahir û Zahirê ji hev neqetîni, ez sed salê din jî dersê bidim Zahirê bêfêde ye.

Mîr li ser gotina Erebo Xoce li Tahir tê xezabê. Tahir tevî malbata wî nefiyê bajarê Mûsilê kirin. Lê belê tira eşqê di dilê her du ciwanan de jî birîn vedabû. Ji ber vî dîrketinê taya eşqê li wan xedarî kir û evîna wan li ser hev hîn zêdetir bû.

ROŞEN LEZGÎN

Hejmareke taybet a Jiyana Rewşen

Çiroka Harbi Soylu "Xezaba Zagros" ku di pêşbaziya Tayd-derê de xelat girtibû, di vê hejmarê jî de didome.

Di vê çîrokê de serpêhatiya komek gerîla ya li ser çiyayê Zagrosê tê zimên. Piştî vê nivîsê çîrokeke Riyat Ahmet Hesen ku qala serpêhatiya du şehîdan dike, heye.

Jiyana Rewşen bi hejmareke taybet derket pêşberî xwendevanan. Di vê hejmara Jiyana Rewşen de nivîsên ji girtîgehan cih digirin. Hinek ji wan bi kurdî hatiye nivîsandin, hinek jî ji tirkî hatine wergerandin.

Kovar bi sergotarê dest pê dike. Di sergotarê de tê gotin ku kovar bi nivîsên ji girtîgehan dikeve du saliya xwe. Her wiha hatiye daxuyandin ku wê di hejmarê bê ya kovarê de ji aliyê dîtarî û naverokê ve hinek guherîn pêk werin. Dîsa di heman nivîsê de qala hinek guherînên di warê rastnivîsê û alfabayê de jî tê kirin ku bi dîtina me, jê re hinek nîqaş û lihevkerin divê.

Ji bilî vê nivîsa navborî, çîrokeke Nevzat Güngör a bi navê "Dil û hêstirên dayikê" ku ji hêla A. Rahman Çelik ve ji tirkî hatiye wergerandin, cih digire. Di vê çîrokê de li ser hestên dayikeke girtî û şehîdan ku ji ber şer koçber bûye tê rawestîn.


Di vê hejmara kovarê de tekane nivîsa ku ne ji hêla girtiyên azadiyê ve hatiye nivîsîn, gotara bi navê "Di zindanên Îranê de çi dibuhure?" ye. Ev nivîs ji hêla Şiyar C. Oremar ve hatiye nivîsandin. Her wekî tê zanîn Oremar yek ji nivîskarên kovarê ye domdar e. Di vê nivîsê de jî rewşa girtiyên azadîxwaz ên rojhilatê Kurdistanê û zilma ku dewleta Îranê li girtiyên dike, bi zimanekî wêjeyî li ber çavan tê raxistin.

Çiroka Harbi Soylu "Xezaba Zagros" ku di pêşbaziya Tayd-derê de xelat girtibû, di vê hejmarê jî de didome. Di vê çî-

rokê de serpêhatiya komek gerîla ya li ser çiyayê Zagrosê tê zimên. Piştî vê nivîsê çîrokeke Riyat Ahmet Hesen ku qala serpêhatiya du şehîdan dike, heye. Navê vê çîrokê jî "Dengê lingên lehengan" e. Hayrettin Dündar bi pexşana xwe ya çîrokî, "Komara Zapê bi agirê Newrozê ronahî bû" beşdariyê di vê hejmara Jiyana Rewşen de dike. Divê bê gotin ku ne tenê pexşan û çîrok, hinek helbestên girtiyên jî di vê hejmarê de cih girtine. Bo nimûne M. Sait Üçlü bi du helbestên xwe; "Şeva 17'ê gulanê" û "Radizem" bûye mêvanê kovarê. Ev helbest jî hêla Salihê Kevirbirî ve ji tirkî hatine wergerandin.

Di nava rûpelên kovarê de çîrokeke ku balê dikişîne, ya Fudayl Calp e. Ev çiroka bi navê "Mala xwediyê tirsê bişewite", guherîna ku şerê azadiyê di derûniya milîsekî de çêkiriye, vedibêje. Di vê hejmara Jiyana Rewşen de çîrokeke ku di pêşbaziya kurteçîrokan a beşa sinemayê ya NÇM'ê xelata teşwîqê wergirtiye jî heye. Ev çiroka bi navê "Tolhildana dîrokî û evîndariya mezin" jî hêla I. Halil Koşar ve hatiye nivîsîn.

Ji bilî van, nivîsên Murat Kaya, Yahya Demir, Fesih Demir-Ahmet Hüseyin, Hasan Haran, Adnan Ürek, fabla Abbas Alkan a bi navê "Serpêhatiya Şer" û sê helbestên Mehmet Kimaz di nav rûpelên ko-



Nivîsarên Girtîgehan

varê ji xwe re cih dîtine.

Ev hejmara kovarê jî hêla çewtiyên rêziman û rastnivîsê de ji hejmara berî xwe, lawaztir xuya dike. Bi taybetî nivîsa ku ji hêla A. Rahman Çelik ve hatiye wergerandin, zêde devokî ye û di warê tewandin cînavk û navdêran de xelatiyê tê de gelek in.

SAMÎ BERBANG

Nobel û Jody

FAYSAL DAĞLI



Kîmyager Alfred Nobel ji zereyên axê efsûna mirinê derxistibû. Piştî Nobel, êdî însanan bi hêsanî û bi piranî hevûdin kuştin. Nobel xwest ku ew bi çewsana dînamîta xwe çiya û kefiran hilweşîne, ahengekê bide xwezayê. Lê xêrnexwaziya însanan kir ku Nobel li îcadê xwe poşmam bibe û ji vê kerbê here. Belê efsûna Nobel, ne ji bo ahenga xwezayê, lê ji bo xerakirina ahenga laşê mirovan hat bikaranîn. Nobel jî ku êdî ji bin barê ve kifşa giran nikaribû derkeve, hatina vê îcadê bixeter, diyarî qurbanên vî îcadê kir. Ji wê rojê vir de, ji bo ku gunehên Nobel kêmbike, ev xelat wekî pardoksekê, ji bo aşîxwazan tê dayin.

Çend roj berê xelata Nobelê ya aştiyê gihîşt xwediyê xwe. Xwediyê xelatê ya îsal jina Amerîkî Jody Williams bû. Jody ji bo qedexekirina mayinên binaxê, tevî çend hevalên xwe ji demeke dirêj ve bû dixebitî. Wê dixwest ku ew çeka xayîn, ew îblîsê bînerdê pêşaroja mirovahiyê û a cîhanê tehdît neke.

Belê, Nobel û Jody êşa bin piyê me, dafikên bin axa me û bextreşiya me anîn bîra me. Em pê hesiyên ku ew xelat li ser navê me ji hatiye dayin. Belê bi sedan

kîlometre xetên mayinkirî welatê kurda jihevûdû qetandiyê û çiya û zevî ji wan re qedexa kirine. Ev çeka îblîsî belkî jî xesara mezintir dide kurdan.

Tenê li Kurdistanê Başûr li gorî texmînên pispörên amerîkayî, 20 mîlyon mayin hatina çandin. Yanê li Başûr li serê kurdekî pênc mayin dikeve. Piştî ku ji bo rizgarkirina Kurdistanê şerê çekdarî dest pê kir, rejîmên Iraqê, ew çeka xayîn li dijî kurdan bi kar anî. Ji sala 1960'an vir de ji bîst hezarî zêdetir kurd di dafikên mayinan de mirin û çend qatî wan jî seqet man. Dîsa hîn jî li Kurdistanê bi dehzeran km² zeviyên dewlemend ji ber mayinan bêxwedî ne. Her wisa her roj çend mayin di binê lingê kurdan de diteqin. Piştî raperîna 1991'ê her çiqas bi alîkariya hin sazîyên navneteweyî çend mîlyon mayin hatin paqijkirin jî, ev xetere wê heta 200 salên din jî kurdan tehdît bike. Îro li hemû kolanên bajarên Başûr, mirov karê di laşê qurbanên mayinan de rastî rêça mayinan vere. Ew an bêling in, an bêdest in, an jî bêçav. Qurbanên mayinan jî sedî 90 sivil û nezî temami wan jî zarok û jin in.

Li Kurdistanê Bakur jî rew wisa ye. Li Bakur jî bi mîlyonan mayin hatine çandin. Leşkerên tirk cihên ku li wan operasyon dikin û paşê vedikişin, an jî ji ber berxwedana gerîla nikarin bikevin, bi mayinan diherimînin. Dîsa derdora bi sedan gund, bi hezaran riyên çiya, bi dehan zozan û daristan bi mayinan hatine lewitandin. Her roj çend ke, bi piranî jî zarok û jin pêl mayinan dikin û ê bisihûd êdî bi laşekî kêmendamiyê jiyana xwe didomînin.

Rejîmên dagirker li gorî zagonên navneteweyî mecbûr in ku nexşeyên sahayên mayinkirî bidin Neteweyên Yekbûyî. Lê van rejîman agahiyên di der heqê heremên mayinan de, ji xwe re veşartine û hilberîn û çandina mayinan jî didomînin.

Mayinên bin erdê bi piranî ji bo sivilan bi xeter e. Gerîla an jî leşker ji ber ku metodên xweparastinê zanin, zêde xesare nabînin. Bedela-mayinan ji zarok û jinan tê standin. Her sal 26 hezar kes li dinyayê ji ber mayinan dimirin çû çend qatê vî hejmarê jî însan birîndar û seqet dibin. Tenê li Afganistanê heta niha jî 200 hezarî zêdetir însan ji sedemên mayinan mirin û seqet man. Artêşa rûsî çiqas çend sal berê jî welatê wan derketibe jî, afganî niha jî, ji bo ku welatê xwe ji mayinan rizgar bikin, şer dikin û ev şer bi gotina wan, ji cîhadê li dijî rûsan jî pêwistir e. Îro li ser rûyê rojgerana me zeviyên ji ber mayinan qedexekirî, ji axa gelek dewletan mezintir e. Û ew herî hindik 200 salên pêşeroja me tehdît dike.

Belê Alfred Nobel nifteya deriyê mirinê çêkir, Jody Williams jî dixwaze vî derî qet nebe, ji bo zarokên ku hê wateye mirinê nizanin, bigire.

Piştî xebatên dirêj e salên û kampanyayên navneteweyî, nêzî sed dewletî biryar da ku wê pîyamana qedexekirina mayinan îmze bikin. Lê di nav van dewletan de ne Amerîkaya Jody û ne jî dagirkerên me hene. Pêwist e ku kurd jî di şerê li dijî mayinan de dengê xwe bilind bikin û piştigiriya tekoşîna Jody a li dijî mîradxwarên xerab ên Alfred Nobel bikin.

Meha Remezanê bela serê sofîka ye

Li bajarê Mêrdînê li Qiziltepe mala mele Qudûs. Xwe bi navê şexitiyê bi gel dabû pejirandin. Ku navê mala Mele Qudûs dihat gotin, her kes ditirsiya û digotin mala mele difirîn. Ji ber ku gel pir bi wî hati-bû girêdan.

Dewleta tirk li hemberê PKK'ê dest bi çalakiyê xwe kir û gelek qontra derxist holê û bi xwe ve girêdan. Ji bo ku wan li hemberê gelê kurd û PKK'ê bide xebitandin. Ji ber ku di dîrokê de dijmin tevaniya gelê kurd ji alî olê de baş keşif kiribû.

Wexta hizbil qontra derket holê di nav wan de jî yek jê malbata mele qudhus bû. Yek ji wê malbatê jî mela Cuneyt di herêmê de ne disekinî û her gav pesnê xwe dida û mala xwe jî kiribû navenda qontra. Her roj gel tehdît dikir û gel ditirsana. Lê gel ji wan ne ditirsiya ji ber ku gelê herêmê bi PKK'ê va gi-

rêdayî bû.

Rojekê girîlayê azadiyê rewşa wî baş nas dikin û cend derban jhe ra belavokêkê rê dikin. Gerîla di belavokê da dibêjin "Mela ji vê rêyê vegere. tiştê te kiriye ne karê mirovahiyê ye." Le mela Cuneyt li hevalan guhdarî nake û karê xwe didomîne. Mela Cuneyt her roj diçe camiyê. Her gav jî berê here camiyê kumhe xwe dide serê xwe her tiştê pis dike dûre jî deçe camiyê. Gava ku mela Cuneyt diçe camiyê di hundirê xwe de pir taswas dike û ditirse. Ku gerîla li pêşiya wî derkevin.

Rojek ji roja di meha remezanê de mela Cuneyt roj bi roj dihele mirovê mele Cuneyt jê dipirsin "Mele çima tu wisa lewaz bûyî"

Mele bersiv dide û dibêje "wela-hîn meha remezanê ye ez pir difikirim ji ber vê jî ez lewaz bûe." Lê bi rastî mele ji ber remezanê ne difikirî li ser mirina xwe difikirî ku

wê kijan rojê bimre.

Roj diçe ber ava û wexta azana mixrobê ye. Mele hêdî hêdî ji mal derdikeve û diçe camiyê ji bo ku bang bide, gel jî fitara xwe veke. Piştî ku mela bang dide bi tirs vedigere malê. Lê gava ku digihê nêzîkî malê du şervanê artêşa gelê kurd li hêviya mela Cuneyt in.

Mele Cuneyt kava kû digihê nêzîkê derî herdu gerîla dibêjin "mele, mele" mele gava li pişt xwe di-hêre heval çarde gulani di serê mele Cuneyt da vala dikin û kumê mele di xwinê de dimîne.

Heval her tiştê mele ji ser radikin û demançê jî radikin. Laşê mele li erdê dirêj dibe. Dema veşartî nî ji xeynê malbata wî kes nayê ku veşêrin. Bi rastî jî qontra bûna mela Cuneyt bû bela serê mele Cuneyt.

MÜCAHİT SEVER

Dikana Qexmeqam

Hemîdo nû bûbûye keya (muxtar). Çend peyv ji keyayê berê bihîstibûn. Tim ji wî re gotinên qeymeqam gotibûn. Rojekê dihere ku pirsgrêkên gund jî qeymeqam re bibêje:

Lê li ber Xwedê nizanibû ka qeymeqam çi kes e, li ku rûdine û karê wî çi ye. Dihere bajêr û raserî dihere dikanekê ji yê dikandar dipirse:

-Gelê ma ka dikana qeymeqam li ku ye?

Yê dikandar:
- Wele qey top avêtiye, îro dikan kiriye!

Elbik

Mendo li ber dikanê sekinibû. Elbikek datanî yek hiltanî. Di dawiyê de elbikek biçûk dît û xiste serê xwe. Ew elbik baş bû, li gorî sefê wî bû.

Dikandar pê hesiya û ecêbmayî ma. Jê pirsî:

-Lawo tu çi dikî?

Mendo:

-Weleh diya min got: "Here elbikekê u baş ket serê te ji me re bikire."

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (90) XAÇEPIRSA

W	E	G	B	B	A	L	A	S	I
M	O	R	I	H	E	W	E	S	
M	I	N	Y	X	W	A	N	A	
R	E	S	A	N	D	I	D	N	
P	A	G	N	I	R	E	M	E	
M	A	S	N	A	V				
I	D	A	X	N	A				
A	N	I	S	K	N	E			

Keskol Helbestva nê kurd (wêne)	Şervan Stran	Xak Bi kurdki rû	Navçeyeke Gümüşha neyê Cınavek	Sembole fosforê Naskirin	Paytexta Arnavütü kê
2			6		Dijberê kevî
Derbas bû Barin, dema borî			Kesê ji Iranê		
		Oksijen Evar (devki)	Geleki Ro jhilata Navin Birdoza Yewnanî		
Helbestvan eki klasik Tipeke kurdî	4		Bere Avakirin		Tipa yekemin Tipeke kurdî
3	Naverast Ehemiyet			Sifir Rû...	
Ling Duman		Bi kurdki hejmar Bi erebî ez			
	Bazar, meydan B ingilizi "an"		5		
Pivaneke granîyê Navekî Jinan		Rîç, kok		1	
			Notayek		


Bersiva Xaçepirsa 88'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin.

Xelata hejmara me ya 90'î pirtûka Seracettin Kırıcı "Eşâ HADEP'ê Jana Amedê" ye

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 88'an Kaset a bi navê Kardeş Türküler qezenç kirine: Veysel Yığıl/Adıyaman, H.M.Emin Hulagu/Stenbol, Mehmet Eteş/Mersin, İ.Halil Gündüzalp/Riha, Ömer Yalçın Êlih

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7

WELAT

ME LI
MERSEDES
QELIBÎ Û
WÎ BELA KIR.
LÊ VÎ ZILAMÊ
... NA!



WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNÎŞAN

Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziyê
(Müessesese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRİYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewropayê)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 84

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsvî
Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selim Biçûk
49 572 18 13 60

Stockholm:
Robin Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
S. A. Fewzî
31 104 85 55 43

Sînorê psîkolojîkî rişyay

Verê çend seran, şaristanê Başûr sero ke qisey biyê, ma vatê qayê qiseyê Afrika ser benê. La belê nika winî niyo, çimke sînorê psîkolojîk rişyay parcîn û teliyê sînoran tenya mendî.

Verdê, di heftêyan ma fina na rîper de namedê "Jûwîna şarê mawa bena nezdi" yew niwîs nûst û ma niwîsî de vardayinê bandorkerdinê başûrê Kurdistanî sero vindertim û ma vat: "Vardayinê bandorkerdinê jû kıştra qedyayin û îflaskerdinê dewleta tirk û PDK anê nezdi, jû kıştra remayinê Barzanî anê nezdi û jû kıştra ra jî jûwîna şarê ma anê nezdi."

Ninan sera di heftêyê nêravêrdî, nê vînanî ma bî rastî. Des û hîriyê meng de serdarînda PKK de, YNK, HSDK, PMK û PZK amey pê ser û PKK wa piya PDK rê, vardayinê girdî virastî. Nê vardayin dima şaristanê Başûr ra Hacûmran, Çoman, Qesrê û Gelalê kewtî înan dest. Nê şaristanan xodestvistina piya, hêzê jûwîna şarîti (hêzên neteweyî yê hevgerî), xeylê erebeyê leşkerî, doçkay, topê hawanî, çend panzerî û xeylî tîfingî vistî xo dest; rojê didin jî Xelîfan, Şaqlawî û Rewandûz vistî xo dest.

Bahdo Hêzê Jûwîna Şarîti (HJŞ), fermangeha PDK wa ke Serê Reş de bî, ay rê vardayino girdî virastî û xeylê endamê PDK kıştî. Ninan miyan de hevey serdarê PDK jî estîbî. Nê vardayinî dima PDK cayê Politbüroya xo Selahatîn ra kirîşt Akre. Fina heman (eynî) roj radyoya PDK (Vengê PDK) weşanê xo vinderna û cayê xo vûrîna.

Nê vardayinan ser, fermanaranê ARGK ra Osman Öcalan 14'ê meng de telefona bi tewrdê panelê MED-TV û HJŞ û rewşê Başûr sero vindart û wina vat: "Tirkîyewa qandê verê PKK giroten, PDK zey desî vena ma ver û awa PDK xo dest keydena û wazena Musul û Kerkuk bandor kiro û xo



dest fino."

Öcalanî qiseyê xo wina ramitî: "PDK wa wazena PKK biqedîno, la belê PDK nêşena PKK biqedîno, ek no şer wina şiro û hevena biramo, no şerdo peyniyê PDK biyaro û PDK biqedîno."

Fermanarê ARGK Öcalanî HJŞ ser jî wina vat: "Hetkarîna PDK û Tirkîye, YNK û HJŞ mecbûr temay tewrdê nê şerî bê. Ma qe jew wext YNK rê nêvat bêrê tewrdê şerî bê. La belê YNK û HJŞ no şer hetê xo ya rind dî û bi tewrdê şerî, xora şerê ma ramitê."

Ancî Öcalanî da zanayin ke înan verî jî veyndarto hemû partîyanê Başûr ke bêrê piya bixeftiyê û kongreyê jûwîna şarîti virazê, la belê PDK goş nêdawo veyndayina ci û dewleta tirk het ca girot û şiyê PKK ser.

Gorey vatenê Osman Öcalanî PDK nê rojanê peynan de şiya Iraq ra hetkarîna waşt, awa wazena ke Iraq jî tewrdê nê şerî kiro. Qandê coya Hêzê Jûwîna Şarîti û YNK

nê kerdinê PDK dî û bî tewrdê şerî.

Nika ma nê-vatenan û virazyayan sero vindim û bewnîm nê virazyayan çiçi berdê, çiçi ardê. Gorey vînanan nînan de karê me esto û ziyane ma çînyo. Çira? Bewnê û biyarê xo vîri, verdê jû di seran Hewlêr vaten de, Silêmanî vaten de, Zaxo, Dihok vaten de çiçi ameyê şima vîri. Bêguman zey mi, cayê dîri ameyê şima jî vîri. Ninan sero qisey ke biyê, mi bi xo vatê qayê şaristanê welatê mi ra nê, Amerîka, Japoniya û Afrîka ser qiseyê benê. Çimke sînorê ke serdestan virastê, ê sînorî ma rê rast ameyê û seredê ma miyan de cayê xo girotîbî. Co-ka jî ma nêşayê ê sînoranê psîkolojîkan birşinîm û bişikinîm. La belê ewro winî niyo, ewro nê cayan ser ke qisey bî, ezo vana qayê qiseyê Amed, Serhad, Botan û Dêrsim ser benê. Yanê sînorê psîkolojîk rişyay û jew parcîn û teliyê sînoran mendî.

MEMED DREWŞ

Di dîroka rojnamegeriya kurdî de gaveke girîng: Yeni Ülke



Serhat Bucak

Toreya rojnamegeriya kurdî, mirov dikare bibêje ku li Rojhilata Navin yek ji kevintirîn tore ye. Lewre sala pêşiya me sed saliya rojnamegeriya kurdî ye. Di 22'yê avrêla 1898'an de Miqdat Mîthad Bedirxan, cara yekemîn li Qahireya Misrê rojnameyeke bi navê Kurdistan derxist. Piştê bi heman navê di sala 1908'an de Sûreyya Bedirxan û di sala 1919'an de jî Mûhammed Mîhrî Hilav li Stenbolê rojname derxistin. Li hêla din di salên 1932-1942'yan de rojnameyên Hawar û Ronahî derdikevin. Bi tevî van her du deman, gava em salên 1990'î ku di wan salan de Halk Gerçeği, Yeni Ülke, Özgür Ülke, Welat, Welatê Me, Yeni Politika, Demokrasi, Azadiya Welat û hwd. çap bûne jî binin ber çavan, em dikarin bibêjin ku rojnamegeriya kurdî Bakur û Başûrê Biçûk ji sê merheleyan pêk tê. Em behsa wan her du merheleyên berê nakin. Mijara me di destpêka merheleya 3'yemîn de derketina rojnameya Yeni Ülkeyê ye. Ji ber ku 20'ê yê mehê salvegera heftemîn a Yeni Ülkeyê ye.

Di du salan de 55 doz 22 berhevkirin û şehîdek

Rojnameya Yeni Ülkeyê 20'ê kewçêra 1990'î li Stenbolê dest bi weşana xwe dîke. Xwediyê vê rojnameya hefteyî ku bi tirkî derdiket li ser navê şirketa İMÇ yê Yusuf Serhat Bucak bû. Di destpêkê de Günay Aslan, piştî çend hejmarên din jî Hüseyin Akyol dibe gerinendeyê giştî yê weşanê ya Yeni Ülkeyê. Dema em ji hêla astengiyên hiqûqî ve rewşa rojnameyê radixin ber çavan, tê dît ku di salekê de der heqê Yeni Ülkeyê de 55 doz hatine vekirin, 30 kes hatine girtin, 18 hejmarên rojnameyê jî hêla hêzên dewletê ve hatine desteserkirin. Her wiha di warê cezayê

Têkoşina gerîla li seranserê Kurdistanê belav bûbû, projeyêke min hebû ku min her gav diamî ziman, diviyabû ji her gundî nûçeyek jî me re bihata û wisa jî bû. Ji ber ku gel bi xwe dinivîsî, lê xwedî derket, traja rojnameyê giştî 60 hezarî.

pereyan de jî berpis û xwediyê rojnameyê li gorî pereyên wê demê ji 2 milyarî zêdetir ceza xwarin. Beriya ku 2 saliya rojnameyê biqede û bikeve sala sisêyan hejmarên hatine berhevkirin zêde dibin û dibin 22. Tîraja rojnameya Yeni Ülkeyê di hejmarên destpêkê de di navbera 8-10 hezarî de diçe û tê, lê piştê ev hejmar li nav Kurdistan û Tirkiyeyê 40, li derveyî welat jî 15 hezar, bi giştî dibe 55-60 hezar.

Serhat Bucak: Yeni Ülke zar û zi manê kurdistanîyan bû

Endamê PKDW'ê Yusuf Serhat Bucak û Serokê Lijneya Hiqûqî ya parlamentoyê ku xwediyê Yeni Ülkeyê bû dide zanîn ku îro jî li Tirkiye, Kurdistan û Ewrûpayê nav û dengê Yeni Ülke yê nehatiyê jî bîrkirin.

Serhat Bucak li ser rewşa wan rojan vê nirxandinê dîke: "Çapemeniya Bab-1 alî li ser şoreşa Kurdistanê ne rast û xayîn bû, di bin bandora îdeolojiya fermî de bû." Yusuf Serhat Bucak dide zanîn ku piştî biryarnamê SS'an (Sansûr-Surgûn) ku ji xalên 424, 425 û 430'an pêk dihatin, pêşî Halk Gerçeği, piştê jî Yeni Halk Gerçeği hatine girtin. Ji ber van sedeman wan biryar girtiye ku rojnameyeke hefteyî û xurt derxin, bi vî awayî jî Yeni Ülke derdikeve holê. Xwediyê rojnameyê Bucak derketina Yeni Ülkeyê bi bilindbûna şerê neteweyî ve girê dide û dide zanîn ku ji wê gavê û şûnde diwyabû ku Yeni Ülke bibe zar û zimanê Kurdistanê.

Dema me gotina Birêz Yaşar Kaya



Hüseyin Akyol

ya bi rengê "salên 1990'an salên Ronesansa Kurdî ye"; bi bîra Serhat Bucak xist, wî ev nirxandin kir: "Ne tenê di sala 1990'î de, her wiha berê vê bi 300 salan ronesansê hebûye. Ronesansa kurdî bi Mele Ehmêdê Cizîrî û bi Ehmêdê Xanî dest pê dîke û heta îro tê. Lê bêguman salên 1990'î û derketina rojnameya Yeni Ülke yê qonaxê gelekî girîng e, di dîroka rojnamegeriya kurdî de."

Hüseyin Akyol: "Diviyabû ji her gundî nûçeyek bihata"

Hüseyin Akyol ku gerinendeyê giştî yê Yeni Ülkeyê bû jî dide zanîn ku, di destpêkê de plan û projeyên rojnameyê

wiha didomîne: "Têkoşina gerîla li seranserê Kurdistanê belav bûbû, projeyêke min hebû ku min her gav diamî ziman; diviyabû ji her gundî nûçeyek jî me re bihata û wisa jî bû. Ji ber ku gel bi xwe dinivîsî, lê xwedî derket, traja rojnameyê giştî 60 hezarî."

Hüseyin Akyol li ser daxwaza me der barê zilma li ser rojnameyê û li ser vê demê nirxandinê kir û piştê jî bîranîneke vegot: "Belê bi rastî jî me gelek rojan zilm û zor dît, lê me gelek xweşikahî û delalî jî dît. Hevalên me şehîd ketin ji hêla kesên tarî ku di nava dewletê de bûn, heta ji me hat me xwest ku em layîqî wan bin, lewre jî heta ji me dihat em bi baldarî li ser nivîsên wan di-sekinîn. Gelek bîranînên me çêbûn, lê şehadeta Vedat Aydın û serhildana Amedê qet ji bîra min naçe. Her wiha Şehadete Hevalê Cengiz Altun ku li Batmanê qewimî, ez bijim ji dilê, hiş û aqilê min dernakeve; Cengiz Altun şehîd me yê yekemîn bû. Li ser navê rojnameyê em rabûn çûn Batmanê, rojêke bi baran û tofan bû, lewre jî balafir tunebûn, me otobosek peyda kir û piştî 26 saetan em ketin nava Batmanê, di rê de ez hûr û kûr difikirim, min di dilê xwe de digot, malbata wî wê rabe û ji me re bibêje 'we serê kurê me xwar', lê dema em çûne mala Cengiz me dît ku ne wisa ye. Dê û bavê Cengiz, tevî mêvanên ku hatine serxweşiyê, behsa çareyên rêlibergirtina kuştinan û rêxistinbûna li dijî van cinayetên hovane dikin. Wan jî hev dipirsîn, digotin 'gelo em dikarin ji îro û şûn ve çî bikin?' Bi rastî jî ez wê rojê tu car jî bîr nakim."

Her wiha Akyol, balê dikişîne ser xaleke girîng ku bûye edet û tore di nav rojnamegeriya welatparêz û şoreşger de. Ew dibêje ku ji bo wan her xwendevan muxabîrekî xwezayî bûye û gotina

Ev gotin û nirxandinên berpîrsên rojnameyê girîngiya vê demê li ber çavan radixin û diyar dikin ku em wisa bi hêsanî negihîştine qonaxa îro.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Yeni Ülke
5-11 Nisan 1992